

d

eriyen şebekeyê têñ  
girtin, digel sîh kesêñ  
ku hevdîtinê dîkin 3 girtiyêñ  
ku ji nexweşxane vegeñine,  
5 saetan li wir dihêlin.  
Di vê navê de midûrêñ  
girtîgehê heqaretan  
li girtiyan dîkin û leşker jî  
sloganan diavêjin,  
marş distirêñ.  
Saet di 15.30'an de jî  
leşker, polis û gardiyan  
ji her du deriyen şebekeyê  
bi şîşen polayî êrîşê  
dibin ser girtiyan..."  
Di dawiya vê êrîşê de  
10 girtiyêñ PKK'yî  
hatin kuştin,  
23 girtî jî birîndar bûn.  
Piştî ku qetşam hate  
bihîstin, hinek saziyêñ  
demokratik heyet ava kirin  
û çûn Amedê.

Xeza Abidin Dino



## Qatil li ser kar in

Diyarbekir her bajarê min e... Çîroknivîsê navdar ê ermenî Mîgirdîç Margosyan ji hevalê me RAHMÎ BATUR re axivî. Röpel 8-9

Kurd, ne tenê li ser axa xwe dijîn, li çar kenarê dinyayê belav bûne. Kurdên Pakistanê jî ji wan koçberan in.

Hevpeyvîna ARAM D. ligel Liyaqet Serdar Xan Kurd Röpel 4-5

Nivîskarê me MîRHEM YÎÇIT bi sernavê "Çapxaneya Apecê: Xelata kurdên anadolê ji bo gelê kurd"

li ser kar û barê çandî û siyasî yên kurdên Anadolê radiweste. Röpel 7

## NAVEROK



Dildar Şeko: Di jiyana kurdî de dahol û zirne

6



Metin Aksoy: Rêxistina Xoybûnê: "Bextê romê tune"

7



D.S. Tizyanî: Ji Evdila Peşêw ne helbest helwest

13



Ji gelên bindest re zanyarı ji gelên serdest pirtir lazim e. Neteweyen ku bindest in, hê azad nebûne; fîr û mejiyê wan ji aliyê dagirkaran ve hatiye kelepçekirin. Neteweyan kurd ji neteweyeke bindest e, ji ber vê rewşa kurdan, lazim e ku em pirtir bixwînin û bizanin. Dema gelê azad ji bo zanistê gavekê diavêje, divê em kurd du gavan biavêjin ku bigihin gelê serdest.

Ji kurdên waletparêz daxwaza min ev e ku bi zarokên xwe re bi kurdî qezî bikin û bi zimanê kurdî wan bidin xwendin. Em ji zimanê xwe û çanda xwe şerm nekin. Dewleta dagirkar politikayeke wer dimeşine; gelên Anadolê gişkan ji rastiya xwe şerm kirine û xwe wekî tirk ditine. Piraniya kurdên welatparêz di malbata xwe de kurdî qezî nakin û ji zarokên xwe re bi tirkî qezî dikan, ev këmasiyeke pir mezin e. Ewqas şoreşgerên azadiyê têkoşînê didin û şehîd dibin bo çi ye? Têkoşîn bi tenê ne servanî ye, lazim e ku têkoşîn di her aliyî de bê dayîn. Têkoşîna mezin; di aliyê zanetiye de bi pêş ketine.

Ji bo vê yekê ji girîng e ku em giraniya xebata xwe bidin ser zanyariyê. Em girîngiyê bidin zimanê kurdî, hunera kurdî û çanda kurdî da ku gelê kurd ji di her alî de bi ser bikeve. Di dîrokê de gelên ku girîng nedane ser zanistê; tu car ne azad bûne, ne ji bi ser ketine.

DOĞANÊ AVDÊ/ DÊRSIM



## Dengeya li ser pişta kurdan

MEHMET GEMSİZ

**D**i destpêka payîza 1993'yan de helbestvanê navdar Şerko Bêkes bi sifatê Wezîre Çandê yê Hikûmeta Federal a Kurdî hatibû Stenbolê; bi mebesta dan û standina çandî û hunerî di navbera Bakur û Başûr de. Wê çaxê ji di navbera Navenâ Çanda Mezopotamyayê (NCM) û Hikûmeta Federal de peymaneke çandî hatibû morkirin.

Di yekê meha rezberê (ilonê) de wî li NCM'ê civînek ji bo çapemenî û weşanxaneyen kurdî pêk anîbû.

Pîst re ji, min pê re hevpeyvînek kiribû. Di nav bersivîn wî de van gotinê wî yên li jêrê bala min kişandibûn:

"Dijmin dema planê xwe li ser doz û meseleya kurdî çedîkin, Kurdistanê yek parce dibînin. Her wiha divê em ji xwe wi-sa bibînin. Ger parçeyen Kurdistanê laşen me bin, Bakur serê me ye, çavê me ye."

Heta, "Ereb Misrê ji xwe re wek navend, wek serek dibînin, Bakur ji Misra me kurdan e" gotibû.

Wê çaxê ev gotinê wî mîna jestek ji bo bakuriyan, ji min re hatibûn. Ez vê ga-

vî, diramim ku gotinê wî rast in. Bi rastî ji Bakur serê me ye, çavê me ye.

Daxuyaniyê Serokê CIA'yê John Deutch, kir ku ez gotinê Birêz Şerko Bêkes car din bi bîr bînim.

Deutch wiha dibêje:

"Em Kurdistanê serbixwe naxwazin. Ji ber ku ew li herêmê, bi taybeti ji bo Tirkiyeyê xetereyeke mezin e."

Di van gotinê Serokê CIA'yê de xweş diyar dibe ku çawa qedera parçeyen din ên Kurdistanê bi Bakur ve girêdahî ye.

Ji ber van sedeman Serokê Giştî yê PKK'ê Birêz Öcalan her tim di axaftin û daxuyaniyê xwe de bala hêzên Kurdistanê, nemaze yên Başûr dikişand ser vê xalê. Di-gote wan:

"Eger em ji navê bêne rakirin hûn ji namînin. Hebûna me sedema hebûna vê rewşa we ye ji."

Parçebûna kurdan hêz û keysê dide da-girkeran; ev ji, dibe sedem ku ew karibin bi hêsanî plan û tevdîrên xwe yên der barê kurdan de pêk bînin. Bi taybeti ji Tirkiye li ber pêkhatina yekîtiya hêzên kurdan asten-

geke mezin e. Tiliyên wê di wan dek û do-jaban de heye ku li parçeyen Kurdistanê di-qewimin. Wê gelek car rê li ber têkoşînî hêzên Başûr girtiye. Bûye asteng ku tu car statuyeke siyâşî ya mayînde li Başûr çene-be.

Ji bo ku kurd tevde ji vê rewşê bi awa-yeke serkeftî derkevin û bigihîjin mebst û kamên xwe, rêxistîneke neteweyî şert e. Navê vê rêxistînê ci dibe ew dizane.

Xalekî din i girîng ji heye, em ji wê ji behs bikin. Guman nîn e ku dengeya nere-wa (nemeşû) li Rojhilat Navîn li ser pişta kurdan çêbûye. Kurd dixwazin pehînê li wê bixin û dengeyeke ku tê de cihê wan ji heye, saz bikin. Ji bo vê ji dîsa pêwistiya kurdan bi sazî, bi rêxistîneke neteweyî heye. Çimkî, kurd ançax bi stratejiyeke nete-weyî dikarin bi miradê xwe şad bibin.

Tevgera azadiyê gelek caran ji bo vê ye-kê deng li partî, rêxistin û şexsiyetîn kurd kiriye; ji ber ku ew vê pêdiviyê qenc dibî-ne.

Ligel van gotinan, ez gerek dibînim ku baweriyeke me kurdan vebêjim. Li gorî vê baweriye erdhej, yanê zelzele wiha çedi-be: Dinya li ser pişta gamasî ye. Gava ga-masî xwe tevdide, yanê xwe dileqîne hej bi dînyayê dikeve. Bi gotina kin û kurt, zelze-le ji ber xwetevdانا gamasî ye.

Îcar li Rojhilat Navîn dinya li ser pişta me kurdan e. Parçeyek bi tena serê xwe nikare zelzeleya şoşê çêke.

## Mintiqewo Tampon

ROBİN REŞEN

**B**adê Cengê Kendawe, yanê reşemiyê 1991'i ra nat şertê başûrê welatê ma, yanê başûrê Kurdistanê bedelyayı, statuko cayê xwi ra leqîya û rewşêka fiili (de facto) viraziya. Şarê ma yê başûrî eşkayêna ena rewşa fili ra zehf istîfa-de bikero û gamanê pîlan bierzo. Eno ga bi qey perçanê bînan zî bibayine keysêkewo baş. Lazim bî destê xwi bi-dayine jobînî, joyîti xwi xurte kerê û ew asasê dewleta ku hamebî adayîşî, bikêf û eşqêkewo pîl dewletiyê xwi vi-râze.

Partî û serokanê başûrî ana nêkerd. Kewtê pê, dapêro û ïnan bi xwi perçeyê binê destê xwi de perçe kerd û sînorî anti. Dewletanê ku Kurdistan perçe û barekerdo perey da ïnan û va pêrodê. ïnan zî pere û sîlehî girot, pê jobînî kişî, şaro bêsûc û guna kişî. ïnan dayi-ne pêro, dewletê neyarî zî kîfî xwi ar-dêne û vatêne: "Bakûrê Iraqî" de istîkarar çiniyo. Eno zî bi qey dewletey ma û ewlekari ma talûke wo." Bi ena plan û propagandayê xwi başûrê welatê ma de zemînê dagirkerdişî weş kerdene, vi-raştene.

Partî û serokê partîyanê başûrî zî pê-rodayış û cengê menfiyeti ra serê zincey xwi nêvînayine û ena plana ku neyaran ro serey mîletey ma, viraştebi roc bi roc ardêne ca.

Wexto PDK û Sadamî miyanê xwi de ro werê hameyî û tê dir 31'ê gelawê-jî de eyş serê Hewlêri, dewleta tirke zî xwi kerd hedre. Edirne ra, Erzingan ra

Niyet û armancê dewleta tirke tenî mintiqewo tampon niyo. Dewleta tirke baş vînena ku başûrê Kurdistanî de statuko xerepêno. Tiya de wazena hewnê xwi ya tarîxi biyaro ca, Kerkük û Mosul bigîro.

Kerkük û Mosul bigîro. Wextê Cengê Kendawe de zî dewleta eno fikrê xwi eşkera kerdbî. Eno sebebêk e, sebebo bîn zî dewleta tirke fikrîna kû eger ba-do statuko bixerepiyo û Kerkük û Mosul nêko dest zî, beno ku kurdî dewle-te virazê. Bi qey enî zî dewleta xwi ke-na hedre ku nêverdo çikewo anahîn vi-râziyo, vernî ro ci bigîro. Yanê dewle-ta tirke eşkera wazena vaco ku "wa başûrê Kurdistanî zî min rê bo. Eger min rê zî nêbo wa kurdan rê qet nêbo."

Herçiqa dewleta vana: "Gerilayî Başûr ra yenê çalakî virazenê, erzenê serê qereqolan, Başûr de otorite çiniyo û he-qê min esto ku ez şorî ewca û mintiqewo tampon virazî." Ena idîayê dewleta raste niya, zûr a. Dewleta wazena bi enî maniplasyon û xapenayîşî niyetê xwi yo rastin bilimno, perde bianco ser.

Gerîla eyro Serhed de wo, Dêrsim de wo, Amed û Xerzan de wo enî eyaletanî Kurdistanî de cengê xwi çalakîyanê xwi keno. Gerilayê enî eyaletanî Kurdistanî ezman ra hamey? Nê. Tiya ra eyseno ku niyetê dewleta ciya wo û hesabê cay başûrê welatê ma ser ro estê. Ne tenî dewleta tirke gelêke dewletê bînî zî başûrê welatê ma ser ro hesab û planan virazenê.

Tevgera kurd ancî zey verî enî komplô û planan vînena û tedbiranê xwi zî gêna.

**SERKANIYA** Giştî ya Artesa Tirk ji bo xurtkirina têkiliya di navbera hêzên dewletê û gelê kurdistanf de fermanek ji hêzên xwe re şand. Navê fermanê "Di ewlekariya hundirin de têkilîdanîna bi gel re û qezenziklîna gel" e.

Serkanya Giştî ji hêzên xwe dixwaze ku nişanen ku reaksiyona gel bikişînin, bi awayekî vekîrî li ser xwe negerîn. Dîsa tê gotin ku dostanîya bi darê zorê bi kêt nayê. Sembolên gur û küçikan ji ser çek û kincê xwe rakin. Bi vê fermanê dewlet qebûl dîke ku hêzên wê sembolên faşistan nişan gel didin. Dîsa diyar dibe ku ew li gel zordariyê dikin.



**CİRLE** Raportorê Neteweyen Yekbûyî yê Azadiya Agahdarîyê û İlaçekirinê Marc Maquette, diyar kir ku pîrsîrêka kurd mijareke pir tevihîv e. Ew dibêjê: "Divê dewlet, astengen ku li ber mafê agahîstandin û İlaçekirina ramanan in, ji holê rake." Maquette, tevî Raportor Abdî Hüseyin ev hevdilîna xwe pêk anî.

Maquette li ser çapemeniya tirk jî rawestîya. Di axaftina xwe ya ku II Esenboğayê kir de diyar kir ku çapemeniya tirk bi tevahî di bin tesîra siyasetê de ye; dayîna rastîye blî vî awayî ne mimkûn e. Marc Maquette dê vê rapora xwe di gulana 1997'an de pêşkeshî Komisyonâ Maferî Mirovan bike.

## NÛÇE

### DIK

Qetlîama Amedê û mehkemeya HADEP'ê

**C**avên kesen şoreşger û demokrat hê li ser darizandina rayedarê HADEP'ê bû, içar dewleta tirk êrisi ser Girtîgeha Amedê kir, 10 kes hatin kuştin, zedetirî 20 kesî ji birîndar bûn.

Em jî roja 25'ê rezberê li ber DGM'ya Enqereyê bûn, gelek diplomatên biyan û nivîskar û rewşenbîrên navdar ji hatibûn ji bo ku çavdîriya darizandina HADEP'ian bikin. Bi rastî wan jî nizanibû li ser vê dozê û êrisa li ser Zîndana Amedê ci bibêjin, bêpaxaviya dewletê ew şaswaz kiribûn.

Li ser rewşa HADEP'ian me dîtinê çend kesan pîrsî. Yek ji wan kesan Mebûs Partiya Keskan Rîza Baran bû. Wî jî diyar kir ku ev doz ne hiqqûye, siyasiye. Rîza Baran got: "Li gorî dewletê kesê ku gava xwe biavîje avahiyeke HADEP'ê súcdar e." Wî da zanîn ku ewê tiştîn li vir dîtine û bûyera li Zîndana Amedê, ragîhîne rayedarê partiya xwe û ji bo lêkolînê ewê komîsyon û heyetan bişînîn.

Berî ku mehkeme dest pê bike, me jî xwest ku wekî her kesî bikevin hundir, lê mixabin hêzên dewletê karta zer kirin hinctet û nehiştin ku nûçevanên çapemeniya demokrat bikevin hundir. Li aliyê din me bi xwe dît ku çend nûçevanên çapemeniya tirk tevî ku karta wan a zer nîn bû jî, ketin hundir.

AZAD ALTUN

# Qatil li ser kar in

**Sî û sê girtiyan 5 saetan li şebekeyê dihêlin. Saet di 15.30'an de jî leşker, polîs û gardiyan ji her du deriyên şebekeyê bi şîşen polayî êrisê dîbin ser girtiyan..."**

**H**ikûmeta Çiller û Erbakan di warê kuştina girtiyan de ji generalen cûntayê jî xedartir derket. Berî vê bi du mehan 12 girtiyan di rojiya mirinê de can dan. Roja 24'ê rezberê içar li Zîndana Amedê 10 girtiyan PKK'yî bi destê hêzên dewletê hatin kuştin.

Daxuyaniya heyeteke ku ji rayedarê IHD'ê û Baroya Amedê pêk hatî, dide zanîn ku qetliam bi serkêsiya rîveberen girtîgeha hatîye kirin. Li gorî vê daxuyaniya ku pişti hevdîtina bi girtiyan re hatîye amadekirin, bûyer wiha qewimiye: "Ew roj, roja hevdîtinê ya qawîşen 29 û 18'an e. Pişti ku refî ye kemîn hevdîtinê bi malbatê xwe re pêk tîne, refî duyemîn diçe cihê hevdîtinê. Hinek ji wan, dema têş şebekeya 5'an a ku li ber qawîşen 35'an e, ji hevalen li wê derê teştekê dixwazin, da ku xwarina ku malbatê wan anîne têxînê. Gardiyan têkili wan dîbin, li ser vê yekê di navbera gardiyan û girtiyan de niqâş derdiye, lê nûneren girtiyan dikevin navbera wan û nahîlin ku bûyer biqewime.

Li ser tahrîkên serekardiyaneke deriyên şebekeye têş girtin, digel sîh kesen ku hevdîtinê dîkin 3 girtiyan ku ji nexweşxaneyê vegeŕine, 5 saetan li wir dihêlin. Hemû hewlîdanen nûneren girtiyan yê ji bo çareserîyê bê encam dimînîn. Di vê navde midûren girtîgeha heqaretan li girtiyan dîkin û leşker jî sloganan diavêjin, marşan distirê. Saet di 15.30'an de jî leşker, polîs û gardiyan ji her du deriyên şebekeyê bi şîşen polayî êrisê dîbin ser girtiyan standiye.

Ji van 33 girtiyan deh kes hatine kuştin, navê wan: Edip Direkçi, Mehmet Nîmet Çakmak, Erkan Perîşan, Rîdvan Bulut, Hakkî Tekin, Ahmet Çelik, Mehmet Kadir Gümuş, Cemal Çam, Kadir Demir û Mehmet Aslan. Ji kesen birîndar 14 heb birine Dîlûkê (Entab), ji wan kesan Kadir Demir mirîye. Niha kesen birîndar li Nexweşxaneyâ Amed û ya Dîlûkê ne.

Navê kesen li Nexweşxaneyâ Amedê ev in: Ramazan Nazlier, Yasin Alevcan, Ramazan Korkar, Mehmet Batuge, Meh-



met Emin Izra, İskan Osal, Kenan Acar, Abdullah Eflatun, Hakkî Bozkuş, Bedri Bozkuş.

Kesen li Nexweşxaneyâ Dîlûkê: Ahmet Sever, Ali Yerme, Şeyhîmus Kaya, Muhamrem Doğan, Yavuz Eken, Cemal Taş, Halil Süren, Ali Kaya, A. Vahap Uyanık, Mühlis Altun, Nusret Yelboğa, İrfan Korkar û Mehmet Pehlivân.

### Qetliam hate lanetkîrin

Cigirê Serokê IHD'ê Hüsnü Öndül bûyer protesto kir û istifaya Wezîrê Adaletê Şevket Kazan xwest. Her wiha Cigirê Serokê HADEP'ê Güven Özata diyar kir ku dewletê heyfa têkçûna li hemberî girtiyan standiye.

Serokê Mazlum-Derê Yılmaz Ensaroğlu bûyer wekî qetliamekê bi nav kir û ew qetliam şermezâr kir. Konseya Navendi ya Yekîtiya Tabîbîn Tirk ev qetliam wekî nimûneyeke politikayen dewletê nîşan da û da zanîn ku hemû kesen birîndar ji serê xwe derbe xwarine. Her wiha, Serokê Liman-İşê Hasan Biber, Serokê ÖDP'ya Enqereyê Haydar İlker, Serokê HADEP'a Çanakkaleye Mehmet Şah, HADEP'a Amedê, ev qetliam şermezâr kirin.

Dîsa NCM'yen Stenbol, Amed, Edene, İzmir, Mîrsin û Hewlîrê, digel kovara Jîyana Rewşenê û Yekîtiya Malbatê Mezopotamyayê qetliam protesto kirin û dan zanîn ku wê li hemberî vê hovîtiye bêdeng nemînîn. Pişti ku bûyer hate bihîstîn, hînek saziyên demokratik wekî IHD û HA-

DEP'ê heyet ava kirin û çûn Amedê. Girtiyen li girtîhîn cur bi cur ev bûyer protesto kirin.

### Doza HADEP'ê siyasiye

Bi rastî ji dema mirov bala xwe dide vê qetliam û çend rûdanen hefteya çûyi, xweş diyar dibe ku dewleta tirk qesta tunekirina kurdan dike. Wek minâk, li gorî hevpeyvîna ku Tansu Çillerê roja 21'ê rezberê bi rojnameya The Newyork Times'e re pêk anîbû, dewleta tirk Saddam vexwendiye başûrê Kurdistanê da ku PKK'ê ji Başûr derxe. Tansu Çiller di vê hevpeyvîne de rastiyekê jî tîne zimîn. Li gorî gotina wê her roj li Kurdistanê bi kêmânî 3 leşker têne kuştin.

Minakeke din, roja 25 û 26'ê rezberê mehkemeya rayedarê HADEP'ê hebû. İdianameya dozger bi xwe, siyâsîbûna dozê bi awayekî zelal xwe dida dest. Dozger Nuh Mete Yüksel, bi van gotinê xwe se dema dozê eşkere dike: "HADEP partiyek e ku ji bo nasnava kurdan a çandî dixebe te." Dozger parastina nasnava kurdan a çandî wekî veqetînxwaziyeke veşarî bi nav dike û piş re jî dibêjê: "Li Tirkîyeyê yek nasnav û yek çand heye û ew jî nasnava tirkî ye." Dozger Nuh Mete Yüksel aştixwazî jî wekî hêmanen sîc nîşan dide.

Her çiqas dema ku ev nîvis hate amadekirin mehkeme hê neqediyabû jî, ev gotinê dozger nîşan didin ku ji bo cezakirina HADEP'ian ci ji destê wan bê ewê bikin.

SAMÎ BERBANG

*Ji kurdên Pakîstanê Liyaqet Serdar Xan Kurd:*

# Heke Kurdistan rizgar bibe emê jî vegeerin welêt



Ji milê çepê ve Aram D., Liyaqet Serdar Xanê kurd û kesên din. Kurdên Pakistanê didine xuyakirin ku ew her kurd mane li deverên ku bu çend hezar kilometreyan ji welatê xwe û dilê geleki ji wan ji bo Kurdistanê hildiavêje.

**b**i rastî min berê çend babet di-dîtin di çendîn rojname û kovarêt kurdî de der barê kurdêt Pakistanê û Meşihedê li Îranê. Min her di dilê xwe de digot: "Xwezi rojekê min hinek ji wan kurdan bidîtana û pirs ji wan kîriba."

Sal hatin û çûn, rêka min jî wekî çendîn hezar kesen kurd bo penaberatiyê qesta Pakistanê kir.

Wan deman min di dilê xwe de digot ev Pakistan e, belê emê çawa û li ku dêrê kurdan peyda bikin. Lî wisan diyar bû ku, çendî me hez dikir wan bibînin, wisan, heta zêdetir jî wan hez dikir me bibînin. Helbet dema me qesta wir kirkir, em penaber bûn û me ci ji wî welati nedizanî; bigire ji ziman, çandî heta bi xwarinê. Tenê riya me Neteweyên Yekbûyî (NY), refitara NY'ê jî digel me zor xerab bû, ji ber çendîn egerê

xuya.

Kurdên Pakistanê zanibûn ku jima-rek kurdan qesta Pakistanê kirine û barû doxên wan gelek xerab in.

Du binemalên kurd hene li Pakistanê; yek ji wan Binemala Serdar Xanê kurd e, ya din Binemala Abdulrehman

da bû, nêzîkî mehekê vekêşa. Dilsoziya kurdên Pakistanê baş diyar bû; ji bilî ku berî vê xwepêşandanê gelek arîkariya penaberan kiribû wekî take kes yan xêzan; lê li vê xopişandanê bi hemû şiyana xwe ji aliye manewî û madî hevkarî kirin.

aliyan ve.

Helbet ez bawer im penaber hene heta niha li Pakistanê mane, ji ber çendîn egeran li wir mane, dostiyeke gelek xweş di gel kurdên Pakistanê heye.

Kurdên Pakistanê kengê cûne Pakistanê û çendîn jimara wan, li ku dera Pakistanê ne, kurdî dizanin an na û çendîn pirsên din, me rojekê li çavpêketinekê (hevpeyvînekê) arasteyî Liyaqat Serdar Xanê Kurd kirin.

Helbet Liyaqat yek ji kurdên Serdar Xanê kurd e, binemaleke ku ji mêt ve rîveberiya eşîra xwe kirine. Çavpêketina me bi zimanê farisî çêbû, çimki zimanê wan ê kurdî guherin ketinê.

\*\*\*

Hün li ku dera Pakistanê dijin?

– Bajarek heye li jêra Pakistanê, dibêjinê Kwête; zorbeya (piraniya) gündêm me li wan der û beran in. Gelek ji me di nav bajarê Kwêtê de dijin. Ev e

**C**udahiya me ji belûciyan an hemû milêtên dî yêng Pakîstanê gelek heye. Ne tenê ziman û xwarin û çanda me cuda ye ji wan. Heta niha em neşen xwarinên gelek tûj wekî wan bixwin, yan rewşen jîn veguhastinê me çendî bêjî ji hev cuda ye.

Xanê kurd e. Van her du binemalan (eşîran) hinek be jî arîkariya kurdên penaber kirin. Çend sal in kurdên penaber li cem wan dijin. Her çendî ev ne mijara me be jî, lê me mexset ew e ku kanê heta ci radeyê xwe bi kurd binasine?

Li sala 1991'ê xwepêşandanek mezin a penaberên kurd li dijî NY'ê pey-

Cunkî Neteweyên Yekbûyî ji bo çendîn mehan hiç hevkari neda penaberan; êdî xwarin û vexwarin û xweşustin û çendîn kar û barê dîn ên bêhtir ji çend hezar penaberan mane li ser milêtê kurdên Pakistanê. Hevkariya wan gihiştê wê radeyê ku navbera kurdên Pakistanê û dewleta wan têk çû, ji çend

ew cih in yên ku binemala lê dijîn egîna kurd hene: Sind û Pencab û Keşmîr.

*Çawan em dişen (dikarin) we cuda bikin ji xelkê dî yê Pakistanê; yan cewan em dé bişen bibêjin hûn kurd in?*

— Cudahiya me ji beluciyan an hemû mileten dî yên Pakistanê gelek heye; ji bo nimûne, ne tenê ziman û xwarin û çanda me cuda ye ji wan. Heta niha em neşen xwarinê gelek tûj weki wan bixwin, yan rewsen jîn veguhastinê me çendî bibêji ji hev cuda ye. Ji bili van hemûyan here binêre sere der xaniyên me evê li bajarfî dijîn, navê me li ser nivisiye û li dûmahiyê navê kurd pê ve ye.

*Wekî (bi qasî) ku hûn pê agahdar in ji kengê ve we qesta virê kiriye?*

— Bi rastî serçavek mukîm û pir bawer li cem me tune ye; lê wekî me ji devê bab û bapîrên xwe guh lê bûye, dibêjin berfî 600 salan e me qesta vêr kiriye. Ci rûdanân wê demê rûdane, ew li me kiriye me qesta vêre kiriye divêt bizivirin li dîrokê ci bûye û berfî 600 salâ an wê ve yan hîn ve tir e. Çimkî tenê wisan dibêjin me rastiya wê divêt bêne vekolîn ji layê dîrokzanan ve.

*Hejmara we digîhe çend kesan?*

— Em evê li Belûcistanê dijîn pirtir in ji 35 hezarî; lê wekî min berfî niha behs kir, kurd li cihen din jî hene, mîna Keşmîr, Pencab û Sindê; lê em nizanî kanê ew çend in.

*Zimanê we yê kurdî ci lê hatiye?*

— Zimanê ku em pê dipeyivîn, em dibêjinê brûkî. Ev zimanê ku em pê dipeyivîn ferq e ji belucî û ci mileten dor û bêren me pê naxivin. Nêzî farisî û



Liyaqet Serdar Xan Kurd

kurdî ye, ez bi dirustî nizanim kengê kurdiya me hatiye guhertin, belkî bi direjiya zemanî û dûrkentinê.

*Ger rojekê Kurdistan rizgar bû we hizira zivirinê di dîlî de heye?*

— Ez di wê hizirê de me, wê jimareke zor bizivirin; dibe hebin rayek dî hebin ku nezivirin, lê wekî ku ez bîr dikim pir wê bêne. Eger, rê bo nebe û hevkî hebe.

*We ci cure peywendî di gel ci bîzân kurdan hebûye?*

— Ew a rast be, heta niha nebûye; me

hez kiriye lê derfeta hindê ji bo me nebü. Dibe ku ji iro paşî ve pirtir hebe. Çimkî zemîne xwestir lê hatiye, çimkî bizavêne kurdan xurtir lê hatine û belav bûne. Ji bo nimûne; niha em digel hev û din dipeyivîn yek ji wan pêngavan e. Me hêvi ye ku em bişen ji iro paşî ve pirtir nêzîki hev bin.

*Li dûmahiyê gelek spas bo hemû gotinêne we yên rewâ...*

— Min jî zor spasî ji we re hene; hêvidar in silav û rêzén me bigihînin her kurdekkî li her cihekî be û her bijîn.

HEVPEYVÎN: ARAM D. / KANADA

## Pîrika Kuçeya Şowalyeyan

FAYSAL DAĞLI



L i bajarê Berlînê li Taxa Kreuzbergê li kuçeyekê navê şowalyeyan (Ritterstr) hatiye danîn. Ger riya we bi vê kuçeya ku navê şervanê windayî lê bûye, bikeve wê li pişt paceyeke qirêj cotek çav, ku ronyîn wan cilmissine, wê bala we bikişine ku li we temaşe dikin. Xwediyê van çavan, ku ew ji qata yekemîn a avahîyeke rengtarî, li rîwiyê kuçeyê dinêre, pîrikeke bêhnilerz e. Ew bi tenê ye. Ew qas bi tenê ye ku navê wê ji tune ye. Dibe ku di wextê xwe de ev nav, ketibe xewnîn gelek xortan û ew di deryaya xemgîniyê de kiribin nav kabûsan. Ev navê vê pîrikê, iro tenê di deftera qewraşekê de, ku ew di heftê de rojekê tê serdana wê, hatiye reşkirin.

Pîrik hemû mirovîn ku di kuçê re derbas dibin silav dike. Ji wan ên ku jê re nebişirin û derbas dibin dixeyîde, carinan jî çêran ji wan

re dike. Hemû rûnişvanen kuçeya şowal yeyan wê nas dîkin. Ew ên ku cara duymîn di ber paceya wê re derbas bibin; wan li bîra xwe ya betilandî qeyd dike û çavên wê bi pêwendîyeke însanî çend saniye be ji dibiriqe.

Di rojekê bişîlî de wê bala min kişandibû. Bi keder bû, di dengê baranê de winda bûbû. Dema ku xwe bi tenê hîs dikir, eş diket canê wê, çavên wê şil dibûn. Bellkî ciwaniya wê dihat bîra wê, an jî windayîn wê, yên şerî mezîn, belkî jî zarokên wê, yên ku bi salan berê terka wê kiribin, an jî evîndarê xwe yê demekî difikirî.

Ji ber rojîn bişîlî û dirêj ku li kuçeyan çûn û hatina mirovan kêm dibû, demsala wê ya xemgîniyê dest pê dikir. Bi ber mirinê nediket, lê ew bi ber tenêbûnê û bêhêziyê diket. Hinek rûnişvanen kuçeyê ku derden wê dizanibûn, car caran di paceyê re çîçek dirêjî wê dikirin û bi du deqîqeyan be ji dixwestin ku kedera dilê wê belav bikin.

Cara duymîn ku çavên me rastî hev hatin, em êdî dosten hev bûn. Bi piranî me dengê hev ji seh nedikir. Biriqîneke kurt, bişîrîneke nîvco... rûyê wê yê qermîçî, pîra min dianî bîra min, ku di zarokatiya min de,

em wekî rohniya çavên xwe diparastin. Ez bawer dikim ku wê jî dirûvê nasekî xwe bi min an jî bi gelek mirovîn din dixist û bi me dadiket nava oqyanûsê bîranînen xwe.

.....

Ev pîrik a ku min navê wê nizanibû, ew sembla humanîzma kapîtalîzma Ewrûpayê bû. Mirovî kapîtalîzmê jî, bi xwedîyê xwe re hêdî hêdî dimir. Ez ditirsiyam ku minê rojekê paceya pîrikê vala bidîta. Qedera pîrikê bi leza metayê ve girêdayî bû. Meta her ku mezin bîbûya, ew biçûk diket û nikaribû li hemberî Yezdanê ola Ewrûpayê li ber xwe bide. Rojekê, wê wekî bi hezaran, deh hezaran mînakîn mîna xwe, ew jî li pişt deriyekî ku kes lê naxe, bi tenê bimira û piştî ku bêhna laşê wê belav bîbûya, wê bîhata dîtin. Wekî heywanekî. Bi rastî ne wekî heywanekî jî, lewre gelek zeman derbas bûbû ku, êdî însanî ji bo wê hezkirina ku di cisnê xwe de nediditîn, xwe avêtibûn bextê kuçîkîn bêziman û sadiq. Li kuçe û kolanîn Ewrûpayê îmkan tune bû ku mirov rastî berateyekî kuçîkîk bihata. Lewre heval û dosten hemû kuçîkan hebûn!

Dûmahîk Rûpel 15

Z

imanê ku  
em pê  
dipeyivîn, em  
dibêjînê brûkî.  
Ev zimanê ku  
em pê dipeyivîn  
ferq e  
ji belucî û  
ci mileten dor û  
bêren me  
pê naxivin, wekî  
diyar nêzî farisî û  
kurdî ye,  
ez bi dirustî  
nizanim kengê  
kurdiya me hatiye  
guhertin,  
belkî bi dirêjiya  
zemanî  
û dûrkentinê.

# Di jiyana kurdî de dahol û zirne

**H**efteye borî, bi dabeşkirina amûrên muzikê li ser sê besan, me nivisina xwe bi dumahîk anîbû. Her wisa bi pêgotiyeke osmanîyan emê berdewam bin li ser babeta xwe ya der barê danasina amûrên muzikê yên kurdewarî de.

Osmanî dibêjin: "Kurd yapar, cingene çalar (kurd çedike gewende lêdi-de)". Bi rastî jî ev pêgotiya osmanîyan wêneyekî pir xweşik li ber çavan radixe. Çimkî ji naveroka vê pêgotinê amûrêkînina gelê kurd xweş diyar dibê. Digel lipasmana xwe jî, miletê kurd kariye (bi taybetî di warê govend û muzikê de) tesireke baş li ser jiyan û şaristaniya Rojhilat bike. Di vî babetî de, nivîskarê pirtûka "Jiyana kurdewarî" Mamosta Toma Bûwa wisa dibêje:

"Stran û dîlanên kurdî bêmuzik nabin û bêguman muzika kurdî jî beşek e ji wê muzika ku jê re 'muzika Rojhilat' dibêjin. Lê, mirov nikare têkilî muzika erebî, ermenî, tirkî bike. Digel wisa jî, di serdema sasanîyan de muzika kurdî, li astekî zor bilind û pêşkeftî bûye û tesireke mezin li stran û awazên gelên derdora xwe kiriye... Gelek ji van amûrên muzika ku di nav kurdewariyê de têne bikaranîn, her ji layê kurdan ve hattine duristikirin."

Rojhilatnasê rûsi Orbelli jî wisa dibêje: "Kurdan, guherînike yekcar mezin di jiyana rewşenbirê Rojhilat de çekiriye. Gelek lawên xwe yên hêja (wek cengawer, helbestvan, muzikjen û hwd.), li jêr navê ermenî, ereb, faris û tirkân ji dest xwe derdane."

Tuma Bûwa her di wê pirtûka xwe de, nimûneyeke wisa dide û dibêje: "Muzîsyenê bi nav û deng Zeryab (789-957 z.), ji binemaleke kurd e û kelkê Mûsilî ye."

Piştî van çend nêrinê zanyar û pisporan der barê muzik û mêjûya muzikê de, mamosta Ürya Ehmed, amûrên muzikê yên ku ji layê gelê kurd ve bi hezaran sal e têne bikaranîn, wisa dide nasîn.

## Amûrên rezm û kutanê

Amûrên çermînî bi darkutan û lêdana van cure amûran, (vêca, ci bi dest û serê tiliyan be, ci bi qayış, darik û gopalên taybet be) ji çermekî ku li ser giroveriye fireh hatiye dorpeçkirin, pêk hatine. Wek: dahol, def (erbane), tepl (dimbilk), dutepli (dutas, neqare), yek-tepli û hwd.

Amûrên bêçerm ku deng ji wan derdikeve: Ewênu ku dengê wan di leşê amûr bi xwe de ye, yan jî, bi lêdan û işandina du parçeyan deng derdixin. Wek: senc (zil) milakî, dar û hesin, sê-nî, cepik, bazin, xirxal û hwd.

**Dahol:** Amûrekî rezmî ye (ritmîk e). Ji bazinçûveki ji dara tuyê, biyê, yan jî, ji dara gwîzê pêk tê. Li her du rûyê bazinçûvi, yan çermê mîhê, yan çermê bi-



Mamosta Toma Bûwa wisa dibêje:

**"Stran û dîlanên kurdî bêmuzik nabin û bêguman muzika kurdî jî beşek e ji wê muzika ku jê re 'muzika Rojhilat' dibêjin.**

**Lê, mirov nikare têkilî muzika erebî, ermenî, tirkî bike.**

**Digel wisa jî, di serdema sasanîyan de muzika kurdî, li astekî**

**zor bilind û pêşkeftî bûye û tesireke mezin li stran û awazên  
gelên derdora xwe kiriye..**

zinê hatiye alandin. Bazinê ku ji dar pêk hatiye yek parça ye.

**Mêjûya amûra daholê:** Piraniya çavkaniyên biyaniyan der barê amûra daholê de dibêjin ku, yekemîn car dahola mezin li serdema nû ya sumerîyan (2100-1950 berî zayînê) hatiye bikaranîn. Belê piştî peydabûna hinek ji kavalanî (lewheyê) sumerîyan, mêjûya daholê vedigerîne salên 2550 bz. Li ser mermereki spî wêneyê miroveki xuya ye ku bi her du destan daholeke mezin dikute.

## Di nav kurdan de rola daholê ya gerdişî

Di dastana "Kela Dimdim" a E. Şemo de, hevokeke bi vî rengî derbas dibê: "Li ber dengê bilind ê dahol û zirneyê Miraz hat. Belê ci dahol û zirne, gava ku li nav wan gelîyan qat qat deng vedida, te digot qey ne daholek û zirneyek e, belkî sed û dused dahol û zirne ne..."

Mele Mahmûd Beyazîdî jî di pirtûka xwe ya "Dab û nerîti kurdekan" de,

"kurdan her ku dizanîn dijmin ber bi wan ve tê, yan wê şerek rûbide, derdiketin cihekî bilind û berdewam tepl û defen xwe lêdidan." dibêje.

Dr. Mahmûd El Hufnî (Ilm el Alat el Musiqiye rûp.27) û Dr. Subhî Enwer Reşîd (Neşret el Qışare, hej.35, rûp.22) di pirtûkên xwe de wisa dibêje:

"Dahol, di sêzdemîn sedsaliya zayıni de, yek ji emrazîn muzika cengê bûye. Di dema şerî xaçperestan de, ewrûpiyan ji rojhilatiyan wergirtiye."

Belê, ev şerîn digel xaçperestan jî, weki tê zanîn, bi serperiştiya Selahedînê Kurdî (Eyûbi), li dijî ewrûpiyan hattine kirin. Artêş û alîkarî hemû ji Kurdistan çûne. Yek ji wan artêşan, bi serperiştiya Mîrê Hewlîrê Kurê Mûsek bûye. Ci gava ku wê fermanek derketa, yan leşker kom bibûna, di dema êrişen leşkerî de, yan di pêşewaziya mîrê welitekî de, daholê rola herî girîng listiye. Her wisa bo me xweş diyar dibe ku dahol, bi taybetî di destpêkê de ji bo kar û barêñ leşkerî, ji layê komelê Zagrosiyâyan ve hatiye afirandin.

**Mêjuya amûra zirneyê:** Amûreke ji amûrên piskirinê ye û ji dar durist dibê. Beşê serekî yê vê amûrê lûleyeke dirêj û bi qul e û ji hemû besen din dirêjtir û mezintir e. Parçeyekî vê amûrê heye ku jêre "nêrik" tê gotin, di devê seri yê zirnê re derbas dibe û ji heft quylan, heta bi qula sêyemîn ya zirnê dadikeve. Di serê nêrik re qulek heye ku parçeyekî din bi navê "pîk, pîpîk" tê re derbas dibe. Hinek zirnejen, ji bo ku dengê zirneya wan nerm û zirav derkeve, di devê zirneyê yê girover û fireh de du-sê kunêñ biçûk vedikin.

Ev amûr, li nav farisan weki "sûrnay", ango neya sor, li nav tirkan ji "zurna" tê binavkirin. Her çende mamosta Ürya peyva zirne weki peyveke tirkî daye nasîn, lê ew bi xwe amûreke piskirinê ya resenî kurdî ye. Çimkî, têkilî di navbera peyvîn <zer û ney> û zimanî tirkî de hiç nîn e. Bê çawa li nav gelên iranî, amûrên piskirinê bi navê "sor-nay, reş-nay, nay-sipî" hene, her wisa "zer" jî rengek e û "zer-nay" ji heye! Yan jî mirov dikare zirneyê weki naya derewîn şirove bike, lewre di kurdi de pêşgira zir, zer û zur heye ku wateya nerast, derewîn dide nîşan, weki zirbab, zirgwiz, zerbî...

Di sedan çirok, dastan, helbest û stranîn kurdewarî de yên ku li ser evîniyê, şer, serhildan û şoreşê hatine gotin, navê dahol û zirneyê bi berfirehî derbas dibe.

İro jî, di van mercen dijwar û mêjûyi de ku gelê kurd tê re derbas dibe, ji berxwedana li girtîxaneyen heta bi serhildana zozan, ji raperîna zarokan heta bi mangirtina kalemîr û pîrejinîn kurdan li nav kolanîn metropolîn mîtingeran û yê ewrûpiyan, dahol û zirne rola xwe dileyizîn û girîngîya xwe di-parêzin.

DILDAR ŞEKO




● 1.10.1949

Komara Çinê ya Gel ji aliyê Partiya Komunist a Çinê di bin serokaliya Mao Ts-Tung (Zedung) de, dl 1'ê Kewçêra 1949'an de hate avakirin. Pişti şerê navxweyî yê 40 salû têkoşîna li hemberf faşizma Japonyayê Komara Çinê ya Gel hate avakirin. Di vê têkoşînê de béguman keda herf mezin a Mao Ts-Tung bû ku bi fîkrên xwe yê sosyalist û bi berhemên xwe yê ku der barê sosyalizmê de nivîsandibû.

● 1.10.1948

## Rêxistina Xoybûn: Bextê romê tune



**R**êxistina Xoybûnê pişti Serhildana Şêx Seid, di nav serhildanê kurdan de cihekî girîng digire. Kesênu ji Serhildana Şêx Seid filitibûn, wisa bawer kiribûn ku divê serhildan di warê siyasi û leşkerî de xurt be, da ku kari be bigihije armancekê. Ji ber vê jî qenat anîbûn ku divê rêxistin hebe. Bi vê mebes-tê, hin kesêne weki İskender Beg, Dr. Mehmet Şukrî Sekban, İhsan Nûri Paşa, Cihat, Mûlazim, Rasim, Bedirxan Beg, Mûlazim Hurşit û hin serokên eşîretên navdar li Lubnanê, di rezbera sala 1927'an de Rêxistina Xoybûn ava dikan. Wan dixwest hêzên kurdan ên ku pişti Serhildana Şêx Seid li hemberi dewleta tirk şer dikirin bigihînîn hev û din û bi hêzeke hevgirti şerê azadiyê bidomînîn.

Bi avabûna Rêxistina Xoybûnê, endamên Xoybûnê qerareke ji çar madeyan pêk-hatî, digirin û sonda biratiyê diweşînin. Ke-sênu ku beşdarî rêxistinê jî bibin wê sondê divê qebûl bikin. Madeya yekemîn wiha ye.

1-Rêxistina kurdan Xoybûn li hemberi rejîma tîrkan a barbar û despot ku gelên kurd diperçiqîne û qetîsamên girseyî pêk tîne li Kurdistanâku di bin bandora Tirkîyeyê de ye, ji bo azadî û serxwebûna kurdan qerara şer girtiye.

Bi vê madeyê armâncaya rêxistinê diyar dikan. Bi sonda biratiyê jî têkili û biratiyê di navbera hêzên kurd de pêk dianîn. Bi amadekirina hin belavokê de jî ev nivîs hebû: "Bextê romê tune, pê baweriya xwe ney-nin."

Pişti Serhildana Şêx Seid, eşîr û hêzên kurdan ku li Çiyayê Agiriye kom bûbûn car

caran livbazî pêk dianîn. Bi avabûna Xoybûnê re İhsan Nûri Paşa, Rasim û Hurşit ji Iraqê çûne Çiyayê Agiriye; di rê de di navbera hêzên Îranê û wan de şer çedîbe Rasim tê kuştin, Hurşit jî dîzivire Iraqê, İhsan Nûri jî xwe digihîne Çiyayê Agiriye.

Li aliyê din di warê siyasetê de jî xebatîn mezin didine destpêkirin. İskender Beg daxuyaniyan der barê kurdan de dide Cemîyeta Navneteweyî, kurê Şêx Seid Eli Rîza û Şerif Paşa jî bi ermenîyan re hevdînan çedîkin, ji bo ku di navbera wan de dostanî û piştgiri çêbîbe. Di warêni dîplomasîyê de ev gav dihatine avêtin.

Di warê şer de jî hêzên kurdan ên ku parce bûbûn, bi hev re têkili datînîn. İhsan Nûri Paşa jî li Çiyayê Agiriye hem hazırlıya şer dikir hem jî bi riya du rojnameyan "Gaziya Welat" û "Agîri agir dîbarîne" alîgir berhev dikirin. Ev rojname digihîstîn Ewrûpayê jî û li Ewrûpayê jî dengekî mezin dabûn.

Di vê navê de dewleta tirk rîveberiyeke giştî (Ümûmî Mufettiş) li Kurdistanâku dide avakirin û İbrahim Tali jî dibe serokê vê mufetişiyê. Ev mufetişî wekî rewşa awarteya vê gavê bû. İbrahim Tali her tim der barê kurdan de rapor hazır dikirin û agahî di-dan dewletê. Lî gorî rapora İbrahim Tali dewleta tirk li Sasonê êrîşek pêk tîne.

Di 29'ê Gulanê de hêzên İhsan Nûri Paşa dest bi şer dikin û azadiya herêma Agiriye ilan dike.

Rêxistina Xoybûnê heta salên 1939'an çalakîyen xwe didomîne, pişti têkçûna Serhildana Çiyayê Agiriye fonksiyonên wê kêm dibin. Bi destpêkirina Şerî Cihanê yê Duyemîn jî temamî ji holê radibe.

METİN AKSOY

Rojnameya Dicle-Fîrat ji aliyê Musa Anter (Şehmus Elmas) û Hüseyin Dikici ve hate derxistin. Rojname hefteyî û bi zimanî tirkî dihate weşandin. Di rojnameyê de nîvîsên li ser pirsgirêka kurdan, çand û hunerê cih digirtin.


● 5.10.1927

Rêxistina XOYBÛN'ê hate avakirin. Pişti Serhildana Şêx Seid, kesênu ji qetîsama dewleta tirk filitibûn, li Lubnanê rêxistîneke bi navê "Xoybûn" û ava kirin. Armanca vê rîxistînê ew bû ku, li hemberf dagîrkerfî û qetîsama dewleta tirk hêzên kurdan, ku ji hev parce bûne, bigihînhîne hev û dest bi têkoşînê bikin.

AWIR

## ÇAVDÊRÎ

MİRHEM YİĞİT



## Çapxaneya Apecê: Xelata kurdên Anadolê ji bo gelê kurd

**K**urdbûn laş û gewdeyekî mezin e, bi şax û per e. Dara kurdan kevn e, stûr û qalind e. Kurd ne bi tenê bûne çend parce belê li giş Rojhilata Navîn û li metropolên welatên cîran jî piiqînê her deverê. Tu bi ku de diherî, tu li kurdan rast têyi. Kurdên Anadolê şax û şulhek kurd in. Ew pêşiyen me ne, bapîr û dapîren me ne ku desthelatdariyên osmaniyan, Mustafa Kemal û İsmet İnönü ew ji welat derxistine.

Sirgûnkirin û nefîkirina kurdan kevn e, seraqet e. Salêna dawî ji hikümetên Özal, M. Yılmaz, Süleyman Demirel û Erdal İnönü, Erbakan û Tansu Çillerê çend milyon kurd ji ax û erdê wan qut kirine, qetandîne. Li Îzmirê, li Stenbolê, li Antalya, Mêrsin û Edîneyê kurdên penaber û mişextû bi milyonan in.

Cihê kurdên Anadolê û sirgûnê di nav tevgera rizgarîwazîyê de sal bi sal diyartır dibe. Barê kurdên Anadolê li welat û li derveyî welat hildigrin mezintir dibe. Ew bûne parçeyeke zindî ji şoreşê û ew di nav rêxistin û komeleyen cebheyî hwd. de cih digirin.

Li gorî texmînan li Ewrûpayê hejmara kurdên Anadolê di nav 40 û 50 hezarî de ye. Kurdên Anadolê girêdayî adetên xwe, rabûn û rûniştinê xwe û kultura xwe ne.

Çawa li Anadolê ew qas qîm û zeman e kurdbûna xwe parastine, asîmîle nebûne û hê di nav xwe û malbaten xwe de bi kurdi qise dikan? Çawa li Anadolê hev û din bermadin, qîma xwe bi her cih û warî nayîn, li Ewrûpayê jî li her bajar û taxê rûnanin. Ew li cihê kurd û kurdên Anadolê hene çavên xwe digerînin û xaniyan li wan deran kirê dikan. Kesênu ku bi malbañî kurdên Anadolê nas dikan û haydarî jiyanâ wan in, zanîn ku kurdên Anadolê di nav xwe de li malê bi zarokên xwe re bi kurdi qise dikan û qet terka kultura xwe nakin.

Îro di nav bereyê rizgariya neteweyî de bi dehan kurdên Anadolê hene, bi sedan kurdên Anadolê piştgiriya tevgera rizgarîwaz dikin û bi awayen cur bi cur têkiliyên wan bi tevgera rizgarîwaz û kurdên din ên giş parçeyen Kurdistanê re hene û li dora şoreşê civiyane.

Li hundir, li Anadolê û sirgûnê û li derveyî welat jî bala kurdên Anadolê li ser welat, guhertin û pêşketinê welat e. Li gorî agahdariyên kurdên Anadolê ku havînê dicin Anadolê û dikevin nav sohbet û civatên gelê me li herêma Anadolê, tu bi ku de diherî behsa şoreşê û şerî gerîla ye û bi taybetî van salêna dawî gelek xwendavanen zanîngîhê çûne Kurdistanê.

Jê û pê de xwîna kurdên Anadolê jî tevlî ya kurdên li welat bûye û di riya serxwebûna gelê kurd de kurdên Anadolê jî gelek şehîd dane. Mîna Huseyin Kangal ji Kirşehrê, Reyhan Kal ji Ençereyê, Hasan Uzun ji Yozgatê, Osman Koçhan û Yakup Aktaş ji Konya-Cihanbeyli, Cemil Seid Barlas ji Konya-Kulu, Haydar Altun ji Kayseri-Sarızlı, Heci Duman û Yavuz Küçük Yavuz û çend şehîden din. Lê tişte balkêş û hêjâyî gotinê ev e ku, rewşenbir û welatparêzen me ji Anadolê ne bi tenê madî û siyasi piştgiriya şoreşê dikin, belê her wiha xizmeteki mezin ji bo edebiyat, ziman û çanda kurdi jî dikan. Di nav kurdên Anadolê de kesênu xwedî çapxane û weşanxane û guhê wan li ser ziman û edebiyata kurdi ye bala mirov dikşînîn. Wekî Ali Çiftçi, Yusuf Dêrsimî û Henefi Çelebî. Bi taybetî xizmetî Ali Çiftçi û çapxane û wêşanxaneya wî Apec ewil ji bo kurdên Anadolê û piş re jî ji bo giş kurdan serbilindahî û rûmetek e. Ali Çiftçi çapxaneya xwe di sala 1988'an de damezirandiye û ew roj û ev roj e bi sê zaravayen kurdi kitêban çap dike.

Çapxaneya Apecê heta niha nêzîkî 100 kitêbên cur bi cur; kitêbên dersê, roman, çîrok, bîrewerî, kitêbên zarokan û hwd. çap kirine. Kitêbxaneya kurd pir qerzdar û spasdare Çapxaneya Apec û xwediye wê Ali Çiftçi ye. Mirov bêmubalexe dikare bibêje ku pişti şehîden kurdên Anadolê û alîkariya şoreşê, kitêbên Çapxaneya Apec mezinîrin xelata kurdên Anadolê ne ji bo gelê kurd û Kurdistanê.

Nivîskar Mîgirdîç Margosyan:

# Diyarbekir her bajarê min e...

Jiyan, pirreng û pirdeng e,  
ji her aliyî ve. Ev gotin iro  
bi piranî tê qebûlkirin.  
Lê berê, çend deh sal berê,  
bi navê yekdengîti û rengîtiyê  
gelek tişt hatin kuştin.  
Ji wan hema bibêjin şop  
nehiştin. Amed, an ji  
Diyarbekir bajarekî kevnare  
û xwedî gelek çand, ziman,  
ol û hwd. bû. iro?  
**Mîgirdîç Margosyan,**  
çîroknivîsê navdar, ermeniyê  
Amedî, bi pirtûka xwe ya  
“Gavur Mâhallesi” ev bajar bi  
me da naskirin. Hevalê me  
RAHMI BATUR pê re li ser  
gelek mijaran axivî.

**H**ün zimanê tirkân, ji gelek ni-  
vîskarêñ tirkân çêtir bi kar tî-  
nin. Heta ku em hinekî zenga  
li ser koka wan bikolin, hûn ji  
tevan ji çêtir bi kar tînin. Lî  
gelo Mîgirdîç Margosyan ji zimanê er-  
menikî û tirkî, dikare kîjanî baş û bi hê-  
sanî bi kar bîne?

Belkî ez iro zimanê tirkî baş bi kar  
tînim. Dibêjim belkî, ji ber ku muheqeq  
di zimanê tirkî de hin tiştîn ku ez niza-  
nibim, hin rengên, hin aliyen xweş ên  
ku ez nizanibim ji hene. Lî disa ji ez wi-  
sa dizanim ku vî zimanî baş bi kar tînim.  
Wekî ku ev hunerek be ji nafikirim.  
Lewra heta 15 saliya min, zimanê min ê  
zîkmakî ez dikarim bibêjim tirkî bû. Di  
mala me de bi zimanê ermenikî dihat  
axaftin, lê min kêm dizanibû. Belkî er-  
meniya min ji sed peyvî nedibihûri...  
Pişti ku ez hatim Stenbolê, ez bi axaftin  
û nivîsandina ermenikî hîn bûm. Ez  
dikarim bibêjim ku, bi ermenikî ji baş hîn  
bûm, lê hê ji ez nikarim bibêjim ku ez  
ermenikî ji tirkî çêtir dizanim.

Baş e, çîma nivîskarê tirkân nikarin  
zimanê xwe bas bi kar bînî?

Ez nizanim, ev gotin a we ye, gelo  
ew vê qebûl dikin? Li gorî min ji bo ku  
mirov bikaribe zimanekî baş bi kar bîne,  
ne hewce ye ku ew ziman, zimanê mi-  
rov ê zîkmakî be. Ev li ser xebat û hune-  
ra mirov e. Di civakê de kîjan ziman zê-  
de were bikaranîn, mirov bêhemî xwe,  
wî hîn dibe...

Zanîna peyvan, ji bo ku mirov ziman  
baş bi kar bîne bes e? Yanê ziman bika-  
ranîn û zanîna peyvan yek tişt e?



Rast e, bikaranîna peyvan tiştîkî  
din e. Yanê tenê bi zanîna peyvan mirov  
nikare ziman baş bi kar bîne. Tiştî heri  
girîng, honandina peyvan e. Ku tu kari-  
bî peyvan baş bîhonî, tu ziman baş bi  
kar tîni, lê her çendî tu zêde peyv biza-  
nibî ji, ku tu nikaribî wan baş bîhonî,  
mirov nikare bibêje tu ziman baş bi kar

devan bi hêsanî jê fêm bikin û nebejin  
“Mebesta vî ci ye, ev dixwaze ji me re  
ci bibêje?”, ku gotineke we hebe, dive  
hûn bibêjin û vekirî bibêjin...

Ji ber vê yekê ji heta ku ji min tê ez  
zimanê gel bi kar tînim. Di nav gel de  
gotinê wisa hene ku di cihê cil hevo-  
kan de tu dikarî bi yekê ji van gotinan

**Z** siyasetê nakim, belkî fîkrêñ xwe bi awayekî  
sergirtî tînime ziman, lê bi rasterast siyasetê nakim.  
Yanê ku li wî bajarî zarokêñ avfiroş  
bi gotina “Ava bûzê, kankilê gûzê, memikê qîzê” ava  
xwe firotibin û min ji wan av kirîbe, vexwaribe; ez vê  
dinivîsînim û tu zirareke vê ji tune ye.

tîni...

Ez bi zimanekî wisa dinivîsînim ku  
gel bi tevahî jê fêm bike. Dema ez dibê-  
jim gel, ne ku ez xwe ji wan mezintir dibînim; ez bi xwe bi zimanekî çawa bi  
hêsanî û baş fêm dikim, dixwazim bi wî  
awayî binivîsînim. Ku ez ‘allameyê cî-  
han’ ji bim, divê ez gotina xwe bi zima-  
nekî sivik û vekirî bibêjim, da ku xwen-

çêtir mebesta xwe bînî ziman. Mesela  
dema tu “Ez kêm dibêjim, tu zêde fêm  
bike” bibêjî, sê nuqteyan ji deynî dawi-  
yê, êdî kî çawa bixwaze, wisa fêm dike.  
Ji ber hinek sebeban mirov her tiştî, her  
car, li her derê nikare bibêje. Di vê rew-  
şê de, tu dikarî hindik binivîssînî, lê zê-  
de bidî fêmkirin...

We kengê dest bi nivîsîna çîrokan

kir?

Di sala 1957-58’ân de. Wê demê  
min lîse dixwend. Min çîrokên xwe bi  
ermenî dinivîsandin û di rojnameya  
Marmarayê de dihatin weşandin. Ew  
rojname vê gavê ji bi awayekî rojane  
derdikeye.

Ku ev kitêbên we berî niha bi deh  
panzdeh salan bihatana çapkirin, li go-  
rî we, wê reaksiyoneke çawa çêbûya?

Bi rastî ez vê gavê nikarim bersiva  
vê pirsê bidim. Min Diyarbekir û jiyana  
wî bajarî nivîsand. Ermén, kurd, súrya-  
nî, keldanî, tirk... Min jiyana wan ya ro-  
jane nivîsand, min tiştî ji ber xwe ve  
dernexistiye. Wekî ku ez wêne bikêsim,  
min ci dît, ew nivîsand. Dema te wêne-  
yek lişand, piştî deh salan, an berî deh  
salan tu eşkere bikî, tiştî ji wêne naçe,  
di dîmenê de guherîn çenâbin. Dimîne  
çi? Dimîne nirixandina mirovan. Ew çawa  
bixwazin, bila wisa binirxînin, ji min  
re ne lazim e...

Ez siyasetê nakim, belkî fîkrêñ xwe  
bi awayekî sergirtî tînime ziman, lê bi  
rasterast siyasetê nakim. Yanê ku li wî  
bajarî zarokêñ avfiroş bi gotina “Ava  
bûzê, kankilê gûzê, memikê qîzê” ava  
xwe firotibin û min ji wan av kirîbe,  
vexwaribe; ez vê dinivîsînim û tu zirare-  
ke vê ji tune ye.

Hinek dikarin bibêjîn “te çîma ava  
bûzê nivîsandiye?”, min nivîsand, ji ber  
ku ev rastîyek bû. Min ev dîtibû, diviya  
min binivîsanda. Ez bi wî zarokê avfiroş  
re mezin bûm. Ew tirk e, kurd e, ereb e,  
ez ermen im... Ev ji bo min ne girîng e.

Di çîrokeke we de, bavê we û hevalê  
wî piştî vexwarînê bi kurdî, ermenî û tîr-  
kî dest bi stranan dikin. Dema dor tê  
strana “Burası Muştur yolu yokuştur /  
Giden gelmiyor acep ne iştir”, hûn di-  
bêjîn: “Kes nizane çîma, lê tevan bi hev  
re bi vê stranê re hêstir dîbarandin.”  
Gelo bi rastî ji nayê zanîn ku çîma hê-  
stirêñ wan bi vê stranê re hevalî dikir?

Hinek stran hene mirovan radikin  
govendê û hinek stran ji, mirovan di go-  
la xemgîniyê de noq dikin. Belkî ji ber  
awaza wan, belkî ji ber têkiliyên wan ên  
bi dîrokê ve girêdayî... Ez nizanim, tiştî  
ku min dît, dema dor bihata wê stranê,  
hêstir dîbarandin...

Ü her kes dizane, ne hewcîyi veşarti-  
nê ye. Tiştîn ne baş hatibûn serê qismek  
ji wan mirovan. Tarîx ji dinivîsînin...  
Berê ci bû, ci qewimîn? Pirsgirêk ne ev  
e, mesele ew e ku emê ji wan bûyeran ci  
ders bistînin ku careke din dûbare nebin.

Dema hêstir dîbarandin, me dizanibû  
ku sebebîn wan hene, lê ci bûn? Me bi

wê zarokatiya xwe ev baş nizanibû...

We ji temenê xwe demeke kurt li Diyarbekirê derbas kiriye, jiyanâ we zêdetir li Stenbolê derbas bûye. Çima Diyarbekir, lê ne Stenbol?

□ Nizanim. Belkî Diyarbekir di bin şîura min de cih girtiye. Dema min dest bi nivîsê kir, hew min dît ku ez Diyarbekirê dinivîsinim... Ez ne bi dilê xwe, ne bi xwestek û biryara xwe hatime Stenbolê. Ez sîrgûn kirim. Kê? Bavê min. Ji bo çi? Ji bo ku ez bi zimanê xwe yê zikmâki perwerde bibim. Yanê ez ne ji kîfa xwe re hatim...

Li Diyarbekirê dibistanê ermenan tune bûn. Ez ji Diyarbekirê hatime veqetandin! Belkî sebebê ku ez Diyarbekirê dinivîsinim ev e.

Dema ez hatim min li Stenbolê tu xweşiyek jî nedît. Tenê mam... Bi tirkî min baş nizanibû. Di dibistana ermenan de hinek xwendekaran henekên xwe bi min, bi zimanê min û yên wekî min dikirin. Ji bo me digotin:

-Kurd hatine...

Yanê di çavên wan de em ne ji wan bûn, em kurd bûn, me ziman nizanibû... Ev rewş zêdetir ez bi Diyarbekirê ve gi-ređam û hezkirina Diyarbekirê bêhtir di dilê min de xurt kir...

Hûn bi fîkr û ramanê xwe, bi dilên xwe ji Diyarbekir veneqetiyane û diyar e ku niyeta we ya vegetinê jî tune ye...

□ Rast e, ez ji Diyarbekirê venaqetim û ji bo vegetinê tu sebeb jî nabînim. Jiyana min, şahî û xweşiyê min (belkî nexweşiyê min jî) li wir dest pê kirin. Ez çendî ji Diyarbekirê dûr bikevîm jî, her li wir im. Xewn û xeyalê min tev li ser Diyarbekirê ne. Bajarê min her ew e...

Li ser Diyarbekirê û jiyana wir ew teferuatén ku we nivîsandine, we çawa ew di bîra xwe de hiştin? Lewre we ji temenê xwe demeke kurt li wir derbas kiriye û di ser de jî gelek sal û zeman borîne...

□ Berî niha jî ev ji min hatibû pir-sin... Bi rastî ez bi xwe jî li vê yekê ecêbmayî dimînim. Çawa çêbû ku ev çend tişt di hişê min de bîmîn? Nizanim û min ji bo vê tu tişt jî nekiriye. Yanê min negotiye, ez baş dêhna xwe bîdime vê, da ku pişti nizanim çend salan binivîsinim. Ev di xewen şevan de jî nedihatine hişê min.

Li îro jî, dema ez didime bîra xwe ku di taxa me de kîjan kevir, li ber deriyê kê bû, di bîra min de ye. Mal bi mal, kolan bi kolan ew bajar ji hişê min dûr neketiye. Bajar û jiyana wî tesireke mezin li ser min hiştîye...

Dema hûn li vî welaî gotina "Ev ermen e" dibihîzin, di hişê we de, di dilê we de ci derbas dibe?

□ Yê ku dibêje "Binêre ev ermen e", mebesta wî ew e ku hûn mirovekî rast in, an mebesta wî ew e ku we mîna nebaşekî bide nîşan? Divê ewil mirov li niyetê binêre... Bi rastî yek ermen e, tirk



# E

z di sala 1938'an de li bajarê Diyarbekirê hatime dînyayê.

Min dibistana ewil li Süleyman Nazif İlkokuluyê xwend. Pişti dibistana navîn, ji bo ku ez bi ermenî perwerde bibim, bavê min ez rîkirime Stenbolê. Li ser vê yekê ez rabûm hatim, hatin ew hatin e... Ez ermenî hîn bûm, lê min kêmek kurdî dizanibû, mixabin ku bi piranî min ew ji bîr kir. Pişti ku min zanîngeh qedand, min dest bi nivîsandinê kir. Dema ku min xelata Eliz Kavukçuyan stand, hevalekî min got, çîrokên xwe wergerîne tirkî, min jî hinek çîrokên xwe bi tirkî nivîsandin û bi navê "Gavur Mahallesi (Taxa Filehan)" kitêbek çap kir. Ev kitêb ji aliyê xwendevanan ve gelek hate ecibandin.

Piş re jî min kitêba xwe ya bi navê "Söyle Margos Nerelisen? (Bêje Margos tu ji ku yî?)" weşand. Wekî ku hûn jî dizanin, ez di çîrokên xwe de Diyarbekir û jiyana Diyarbekirê tînime ziman.

e, laz e, kurd e, pomak e, keldanî yê, nizanim pîvazê deynî berê, dibe meftûne û tameke xweş dide.

Meftûne xwarineke Diyarbekirê ye... Divê insan ji hev hez bikin, xwe hînî jiyana bi hev re bikin.

Dema we leşkerî kir, navê Mîgirdîç Margosyan tu astengî li pêşîya we der-nexist?

□ Ne li leşkeriyê, bi tevahî û her dem ev nav li serê min bûye bela. (Berî her tiştî nikarin baş telafûz bikin. Ez jê yên ku nikarin telafûz bikin aciz nabim. Ji ber ku ez jî nikarim bi hêsanî hinek na-vân biyan bi kar bînim). Yanê hê di serî de navê min şaş telafûz dikan. Nerehetî ji vir dest pê dike. Piş re jî meraq dikan: Çima ev nav? Li her aliyî Ehmed, Mihe-med, Hesen hene, bi carekê navekî "xe-rîb" Mîgirdîç, Mixurdiç derdikeve pêşîya wan. Ev kî ye, koka vî ci ye? meraq dikan. Û hin tiştîn din...

Cawa ku min di zanîngehê de dest bi xwendina felsefeyê kir, min komplek-sen xwe avêtin. Navê xelkê, nasname-

yên xelkê min eleqeder nakin. İnsan e? Temam... Yanê dibe ku hinek şexs bi nasnameya te, te biçük bibînin, te taciz bikin. Lê ku tu jî mîna wan hereket bikî, tu dibî wekî wan, dadikevî seviyeya wan...

Dema ku ez bi insanan re dikevime tekiliyan, berî her tiştî nasnameya xwe diyar dikim. Di cihê ku piş re derkeve holê û bibe sebebê nerehetiyan, ez di serî de dibêjim:

Mîgirdîç Margosyan... Ermen im... Diyarbekirî me, filan bêvan... Bila min bi vê nasnameya min qebûl bikin.

Di jiyana leşkeriyê de yên ku ev nas-nameya we qebûl nedikarin, hebûn?

□ Belê, kesen wisa jî hebûn... Ez li wir "teymen" bûm. Piraniya leşkerên ku kurd bûn, bi tirkî nizanibûn. Yek ji wan nexweş bû, piyê wî diêşîya. Nekaribû derdê xwe ji kesî re bibêje, an jî gotibû lê kesî guh nedabûyê. Hate ba min. Te-nê digot:

# Bêrîvan tê çi wateyê?

Dewranbihurî,  
şerê çekdarî civata  
kurdan guherand.  
Dagirkeran jî ne pez  
hiştin  
û ne jî hiştin  
ku kurd herin zozanan.  
Lê belê em dibînîn ku,  
dagirkeran nikaribû li  
Kurdistanê bêrîvanan  
biqedîne.  
Îro jî bêrîvan  
di nav şerê rizgariyê de  
roleke rind dilizîn.

**C**end meh berê ez rastî bernameyeke Show TV'ê rast hatim. Bername ji aliyê Hûlya Avşarê ve hatîb amadekirin, Şanoger Yılmaz Erdogan jî wekî mîvan besdar bûbû. Erdogan li ser bêrî û bêrîvanê stranek got, paşê jî rabû peyya bêrîvan wekî, 'keça ku şîr didoş' li tirkî wergerand. Piştî vê wergere min pêwist dît ku ez li ser wateya bêrî û bêrîvanê çend tiştan bibêjim.

Em sîftî li morfolojiya bêjeya 'bêrîvan'ê binêrin. Bêjeya bêrîvan ji na-vekî û ji xurdepaşekê (paşgir) hatiye pê. Nav "bêrî" ye û xurdepaş jî "van" e. Yanê, Bêrî-van. D. İzoî, di ferhen-ga xwe de peyya 'bêrî' yê wiha reva dike: Yek, cihê ku pez lê tê dotin, di-du; tiştî mirov bêriyê dike (min bêriyâ te kiriye).

Dema em li van her du wateyan dî-nêrin em dibînîn ku, wekî mirov bibeje 'Min bêriyâ malê kiriye', 'min bêriyâ welat kiriye'. Kurmancan navê 'bêrî' dane cihê ku pez lê tê dotin. Xurdepaşa 'van' jî tê wateya yê ku kar dike. Weki; 'xwendevan', 'aşvan'. 'Bêrîvan' jî tê wateya yê ku di-here cihê bêriyê, cihê evîniyê, cihê ku bêriyâ wê hatiye kirin.

## Çima ne şîrdoş île bêrîvan?

Dema em li gorî wateya wê lê dî-nêrin, em dibînîn ku, kurmancan ji bo



ku keç û jin 'şîr didoşin; an jî ji çûn û hatina pezdotinê re, nedigotin bêrî û bêrîvan. Heke wisa bûya, wê bigotina 'pezdoş', an jî 'şîrdoş'. Lê belê nego-tine. Ji ber ku li wirê hesreta dil, bêri-yâ evîndaran heye.

Ev rastî di çanda kurdan de jî xwe bi me dinimîne. Ji ber ku di çanda kurdan de gelek stran, helbest, çirok, serpêhatî li ser bêrî û bêrîvanan hene. Ji ber vê yekê jî, bêjeya bêrîvan di çanda kurdan de cihêkî girîng û birû-met digire. Jêderka wê jî ji aboriya kurdan tê.

Gava ku em li aboriya kurdan dî-nêrin, em dibînîn ku debara kurdan li ser pez û dewaran e. Lê belê bi piranî jî li ser pez e û pezê wan jî, ji biharê heta payîzê li çolê dimîne. Ji ber ku pez, li cihê ku av û hewaya wê hênik e, hez dike, giyayê çiyayê Kurdistanê pir e, lewma pez nayîn malê û li malê xwedî nakin.

## Bêrî, cihê hesretê ye

Vê yekê jî li gorî xwe rengek daye civata kurdan. Ji ber ku keç û xorten kurdan li ber pez hatine ba hev û li wir jî ji hev hez kirine. Ji ber ku keç û jin, rojê du caran diherin wî pezî di-doşin û şîrê xwe tînin malê, keç bi vê abûbê ji mal derdikevin. Gelên dêmanî jî bi awayekî din hev dibînîn. Ji ber ku aboriya wan li ber erd û zeviyan e, keç û xorten wan jî hev li derinê din dibînîn. Lê yên kurdan ancax hev û din li bêriyê dibînîn.

Keç û jinên kurdan ji bo çûn û hatina bêriyê ji malê derdikevin, xort jî keçan dibînîn û dilê wan dikeve hev, dibin evîndarê hev. Ev evîndar dema hev nebînîn bêriya hev dikin. Van evîndaran, ancax hev û din li cihê ku pez lê têye dotin, an jî di çûyîn û hatinê de dikarin hev û din bibînîn. Ji bo vê jî kurmancan li cihê ku pez lê tê dotin re gotine bêrî. Yanê cihê hesretê, cihê ku dermanê dilê evîndaran e.

Ev yek han bi kîrinê bêrîvanan jî derdikeve holê. Ji ber ku, bêrîvan ku ji malê derketin ku herin bêriyê, kin-cen xwe yên pak û nû li xwe dikin, xwe dixemlinin, diyariyê wekî le-xik, gore, kîs, destmal, qeytan... ji evîndarê xwe re dibin.

Korten kurdan jî wexta bêriyê, an diçûn ba şivan an jî derdiketin ser riya bêrîvanan. Da ku ew jî evîndara xwe - heke ji dûr ve heke ji nêzikahî ve be jî-bibînîn û heke karibin keysa xwe jî bibînîn pê re bipeyivin. Hesreta dilê xwe ji hev re bibêjin.

Di dilê her kurdekkî de bêrîvanan heye. Ji bo vê jî kurd, strana bêrîvanê ji nava dilê xwe dibêjin. Di wê strana bêrîvanê de hesreta evînê, bêriya evîndarê heye.

## Welat bû cihê bêriyê

Dewranbihurî, şerê çekdarî civata kurdan guherand. Dagirkeran jî ne pez hiştin û ne jî hiştin ku kurd herin zozanan. Lê belê em dibînîn ku, dagirkeran nikaribû li Kurdistanê bêri-

vanan biqedîne. Wexta ku li Kurdistanê gund, pez û dewar hebûn keçen kurdan diçûn îro bêrîvan di nav şerê rizgariyê de roleke rind dilizîn lê bêriyê lê niha rola wan hatiye guhartin.

Dîsa bêrîvan xwe dixemilandin. Ji ber ku digotin, bila heval nebêjin keçek pîs e, nabe gerîla. Edî stranê wan jî hatine guhartin. Berê li ser evîna dilê xwe digotin.

Lê belê niha li ser evîna welat dist-rênen. Ew xwarinê ku bi xwe re dibirin, niha didin servanê azadiyê. Ew diyariyê ku berê ji evîndarê xwe re dibirin, diyarî servanê azadiyê di-kin.

Berê bi hev re qala dost û yarêne hev dikirin, lê niha qala bindestiya welat, şerê azadiyê û serxwebûnê dikin û servanê azadiyê der heqê di-jimin de agahdar dikin. Dijminê xwînxwar got, "Eez gundêwan bisewitînim, pezê wan bikujim edî ew naçin bêriyê û tu zerarê nadîn min". Lewma li Kurdistanê kevir li ser kevir nehişt û hemû kurd sîrgûn kirin, ji welat bi dûr xistin.

Lê belê dijminê dagirker nikaribû bêrîvaniyê ji dilê kurdan derxîne. Ji ber ku keç û xorten kurdan bûbûn evîndarê welat. Lewma, îro keç û xorten kurdan ên ku ji welat derketinê û çûne metropolan, berê xwe dan welat û diherin cihê evînê, cihê hesreta du hezar salî; diçin aliyê bêriyê. Lewma îro welat bûye 'bêrî' û hemû keç û xorten kurdan jî bûne 'bêrîvan'.

AGIT YILDIRIM



Li navendê çandê çalakiyên vê hefteyê.

Li NÇM ya Stenbolê:

● 28.9.1996-Şemîf

Konser: Koma Aglre Jîyan, Koma Gulen Xerzan, Koma Gulen Mezrabotan.

● 29.9.1996-Yekşem

Konser: Koma Çiya, Koma Serhildan, Koma Rojhilat

Film: Mızgîn

Li NÇM ya Izmirê:

● 28.9.1996- Şemîf

Çalakiyên salvegera damezirandina NÇM'ê

Konser: Grup Devinim, saat 18:00

Şanoya Hêvi, Koma Dengê Bahoz, Koma Kendal

Çalakiyên Goranibêjén NÇM'ê, saat 19:00

Li Stran'ê:

● 28.9.1996- Şemîf

Konser: Koma Dengê Azadî, saat 16:00

● 29.9.1996- Yekşem

Semîner: "Ulusal Sorun ve Gençliğin Görevleri" (Doza Neteweyf û Erken Xortaniyê)

Axıver: Nurettin Basut, saat 16:30

## RÜDAN

# Diyarbekir her bajarê min e..

*Destpêk Rûpel 8-9*

"Lingê min, lingê min diêse." "Yedek Subay"ekî hevalê min hebû, bijîşk bû, min jê re got, wî bir tedawî kir.

Ev di nav leşkeran de hate bihîstîn: Teymenek bi kurdî diaxive, kurdî fêm dike, lê navê wî? Navê wî Maqaryos e!..

Navê min bû Maqaryos Teymen. Ci-ma? Wê demê bûyerên Kibrîsê û Makaryos zêde di rojevê de bûn... Lê digotin Migirdîc an Maqaryos, ne xema min bû. Heta ji min dihat, min alîkariya wan dikir. Hevalên min ên zabit diçûn li gazinoye bi îskambîlan dilîstîn, min tebeşîr ji, ji berika xwe dikirîya û min ew leşkeren ku nizanibûn bixwînîn û binivîsinîn, perwerde dikirin, ew hîni xwendin û nivîsinê dikirin. Û wan jî, ji tevan bêhtir, ji min hez dikirin.

Pirseke nexweş: Hûn çîma, ji bo ci di-nivîsin, mebesta we ci ye?

Însan dema dinivîsin, ji ber ci di-nivîsin? Ewil ji bo xwe, ez jî ewil ji bo xwe dinivîsinim. Pişt re jî, bi nivîsen xwe dixwazim mesajî bidime însanan. Fîkr û ramanê te hene? Ku hebin û tu tenê wan ji xwe re veşîri, zêde qîmeteke wan tune. Lazim e tu wan fîkrîn xwe li însanan par bikî û ji parvekirinê ji zewq bistîni. Yanê di fîkr û ramanan de timahî ne baş e. We-kî elokan tenê ji xwe re bifikirî, ci qîme-ta wê heye?..

Ji bo nivîsinê hûn hinekî dereng ne-manê?

Ev sîh û pênc sal e ku ez dinivîsinim, derengiya ci?! Lê ji ber ku min bi ermenkî dinivîsand, kes bi min agahdar nebû. Derengiya min di nivîsandina tirkî de ye. Kengê ku kitêba min xelat stand û hevalekî min got "Kitêba te xelat ji stan-diye, were vê wergerine zimanê tirkî", ez rûniştîm min kitêba 'Gavur Mahalle-si' ji nû ve nivîsan. Ku min bi tirkî ne-nivîsanda, nedîghîştama te û gelek ke-sen din...

Hûn çîrokan dinivîsin, we nivîsina

romanê ji ceribandiye?

□ Ji bo nivîsına romanê ji çend hewl-danê min çebûn, lê min bi xwe ji tiştên ku nivîsibûn neecibandin, li xweşiya min neçûn. Min dev jê berda. Di vê mijarê de yek-du xebatê min ên nîvco hene. Ezê bikaribim di rojên pêsiya me de van bi-qedînim? Nizanim...

Di navbera nivîsına çîrok û romanê de hûn ci serqiyetê dibînîn?

□ Yek dirêj e, ji bo wan kesen ku go-tinêwan zêde ne, ya din kurt e, ji bo min û yên mîna min... Lê wisa bawer im ku êdi di vê demê de wextê xelkê ji bo roman xwendinê tune ye.

Madem jiyana we bi piranî li Stenbo-lê derbas bûye, we çîma li ser vî bajarî ji nenivîsand?

□ Min nivîsandiye, çawa! Ez li vî we-latî nivîkarê yekemîn im ku li ser "gece-kondu"yan nivîsandiye... Min di salên 1958'an de li ser "gecekondu"yan çîrok nivîsande. Lê ji ber ku bi ermenkî hatîne weşandin, nayêne zanîn. Belki di rojên pêş de, ezê van jî bi tirkî binivîsinim. Nabêjîm werger, ji ber ku ez dema nivî-sen xwe ji ermenkî werdigerînime tirkî, bi rastî rûdinim, ji nû ve dinivîsinim.

Di çîrokên we de ji xemgîniyê zêdetir pêkenî heye, xweşî ji nexweşiyê gelek zê-detir in û nexweşî bi xwe jî, zêde nayêne çav. Gelo li vî welatî xweşî ji nexweşiyê zêdetir e?

□ Ku we bi balkêşî xwendibe, di çîrok-en min de pêkenî heye. Ez naxwazim ku xwendevanan zêde xemgîn bikim. Dema mirin jî derbas bibe, bila dîsa jî însan bi xemgîniyê re, hinekî jî bikaribin bîbesimin (bibîşîrin). Mesela ez bi qedere-bawer nakim. Ji ber vê jî insan li hemberî mirinê ci dîkin, çawa hereket dîkin? Ez di safoka xwe de disefinim û hê dini-vîsim.

Di çîrokeke xwe de zaroktiya xwe tî-nime ziman. Şeş-heft salî me. Di nav li-vîna xwe de dirêjkirî me û ji Xwedê tiştan dixwazim. Dilê min diçe ci, jê dixwa-

## TÎSK

SÎRWAN REHÎM



Ji ber ku nivîsa nivîskarê me nekete destê me, vê hefteyê me nekarî cih bide nivîsa wî...

zim. Ji bavê xwe nikarim her tişti bixwazim, ji ber ku imkanê wî tune ne. Lê Xwedê? Îmkanê wî bêdawî ne... Her tişti jê dixwazim. Lê tiştên min jê dixwestin nedan û xaniyê me jî bi serê me de anî xwarê... Nêzîkahîya min ev e. Nikarim rûnim heş saet felsefeyê bikim. Çirokekê dinivîsinim. Kê, ci jî fêm kir!..

Di warê ziman da (mixabin ku ji bo kurdî nikarim eynî tişti bibêjim) tirkî ya Diyarbekirê xwedî rengekî taybet û bal-kêş tê xuyan ku di zimanê bajarekî din de em vê nabinin. Mesela berî çend rojan ez li malekê bûm, jîneke Diyarbekirî destpê-kerîna baranê bi gotina "yağmur tene-lendi" anî ziman... Di warê wêjeyê de jî ev reng, ev taybetî xwe diparêze. Li gorî we sebebên vê taybetiyê ci ne?

□ Rast e, taybetiyeke zimanê Diyarbekirê heye. Biwêjîn wan, gotinêwan kûr in. Mesela li Diyarbekirê dema zarokî yekî, an jî yekê anjiyan bibe (bimire), li deren din "kezeba min şewti" dibêjin, lê Diyarbekirî dibêjin: "Cigerim dağlan-di!.."

Yanê di wê demê de, gotina "şewti" sivik dimîne, erzan dimîne. Lê daxbûn, daxkirin... Wê êş û şewatê bi her aliyî tîne ziman. Gotina herî bi tesîr û herî kurt e.

Diyarbekir ne bajarekî zêde mezin e, lê tê de ji gelek miletan însan bi hev re, li ber pozê hev jiyana xwe derbas kirine. Ev pirreni û dewlemendiya ziman jî, ge-lo ne ji vê pir-rengiye neteweyan be?

□ Rast e. Li bajarê Stenbolê jî, ji gelek neteweyan insan dijin, lê bajar gelek mezin e. Têkiliyên wan bi hev re zêde xurt nabin. Ü hema bibêje kes rengê kesî nizane jî. Lê ji ber ku Diyarbekir biçûk bû û her roj bi hev re dan û standin diki-rin, pir-rengiyeke dewlemend li ziman zêde bûye. Her neteweyekê rengê xwe dayê... Ü zêde jî, belki ji ber vê yekê ye ku di nivîsen xwe de ez wî rengî biinad diparêzim.

Pişti ku hûn ji Diyarbekirê vejetiyan, careke din hûn çûne Diyarbekirê, ku hûn çûbin, kengê?

□ Pişti ku vejetiyam, nêzîkî cil salan neçûm. Par Belediye Diyarbekirê ez dawet kirim, ez cum. Bi rastî min nedixwest ez herim. Min dixwest ku ew Diyarbekir min hişt û jê vejetiyam, bi wî ren-gê xwe di serê min de bimîne. Ü tiştê ku jê ditirsiyam, hate serê min. Diyarbekir gelek guheribû. Dilê min şikest... Lê pişt re min ev guherin ji bir kir û dîsa ez li Diyarbekira xwe dijîm. Di serê xwe de, di dilê xwe de dîsa ez wê Diyarbekira xwe digerînim...

Rastiya Diyarbekirê iro cuda ye. Ji her derê koç kirine, hatine wir. Li her derî sefalet û perîsan... Bajarê min hilweşandîne. Feqîri, belangazî, hejarî... Ji zarakan mirov nikare bimeşe. Pişti cil salan dema ku çûme Diyarbekirê, min xwest hinek dîmenan bi xwe re bînim. Dema min bi kameraya xwe, li derdorêن xwe dinêr, zarakan ez turist dizanibûm, dihatin ba min "mark.. dolar.." digotin. Di wê demê de kezeba min dax bû!.. Ev welatê ku min berî cil salan li wir hişt û çûm, ev bajarê ku berî cil salan min li wir hiştibû, pişti cil salan bi "mark" bi "dolar", bi "okey" dihat pêsiya min... Bi çavên "okey" li min nêzîkahî dikir... Ez eşiyam. Ji ber ku Diyarbekir bajarê min bû, ez zêde pê eşiyam. Lê ev nayê wê maneyê ku ez bi Midyadê, bi Enqereyê, bi Ruhayê, an ji bi Sinopê naeşim....

Xebata we li ser kitêbên nû hene?

□ Her nivîskar bersiva vê pîrsê bi "erê xebatê min hene" didin, ez jî dibêjim, erê hene...

Di dema we de, li sîka Diyarbekirê zi-manê bazarê ci bû?

□ Piraniya mîlet bi tirkî nizanibû. Ne yê bajêr, yê gundan. Li gundan kêm kes hebûn ku bi tirkî dizanibûn. Ji ber vê yekê ji, temamê esnafan bi kurdi dizanibûn. Mesela ez li ba xalê xwe yê hesinkar şagirt bûm. Xalê min ne tenê kurmancı, di-mili ji baş dizanibû, wekî zimanê xwe yê zîmkâr. Ew ji gund hatibû, lê esrafen din jî, ji bo ku bikaribin ticaretê bikin, mecbûr bûn ku kurdi hîn bibin. Ez jî li dikana xalê xwe hîn kurdi bûm.



Apo can

Gava ku li dû jiyaneke birûmet be mirov  
Ew ne biyan e ji mirinê re...

Birayê Evdila!

Tu her tim

Di nav dilê me yê germ de veşartî yi.  
Wisa bizane..

Li ser navê Malbata Gülmüs  
Şükrü Gülmüs

Abdullah Gülmüs

# Rovî bû zembîlfiros

**R**ovî li gelek deveran digere, li herêmekê rast tê û dibêje: "Ji bo min a qenc û baş ew e ku ez ji vê derê neçim û vê derê ji xwe re bikim war û ez nehêlim ku ji min û pê ve kesek li van deran biji da ku ez serbixwe bimînim."

Rovî li wê derê dimîne û ji xwe re dike kar, timî dihere nava zevyan qayışen cotkaran dixwe. Ew bi vê tenê ji nasekine û dihere nava gundê li der û dorê, mirîşkên wan jî dixwe. Nêçîrvanan jî ev bûyer bihîstîn û li her derê ji bo ku rovî bigirin xefik vedan. Lê roviyê kone nediket xefikan. Rovî ji pêjna gur kir ku bêyi xebera wî hatiye wê herêmê.

Ew ji hatina gur a wan deran pir aciz bû û got, ezê vî gurî bibînim û ezê wî bi ser xefikê nêçîrvanan de bişînim da ku nêçîrvan wî bigirin û wî bikujin ku ez jî ji wî xelas bibim.

Rojekê rastî gur hat û bi zimanekî şîrîn got:

-Birakê gur tu û van deran, ez ewqasî li hevalbendekî mîna te digeriyan; ez dibêjim niha tu birçiyî ji ne wilô?

Gur got:

-Erê birako bi Xwedê ez birçî me.

Rovî got:

-De were em herin mal. Rovî da pêşa gur û dan ser riya mal. Rovî gur anî ser riya ku nêçîrvanan xefik vedane û got: "Birako tu bimeşe ezê avekê birjînim û ezê bigihêm te."

Gur mesiya çû û bi her du lingêن xwe yên pêşîn ve ket xefika nêçîrvanan û bû qîrîna gur. Wexta qîrîn ji gur hat, rovî got:

-De here, ez ji te xelas bûm. Gur geleki li ber xwe da û bi zehmetî xwe ji nava diranê xefikê xelas kir û bi hêrs vegeeria û li rovî geriya ku tola xwe jê hilîne.

Rovî jî ji wir vegeeria nava daris-tanê, ji xwe re şivênen daran berhev kirin û bi wan zembîl çekirin. Gur bi hêrs hat cem rovî û got:

-Segbay te ez bi ser riya çûnê û nehatînê de şandim, hindik mabû ku ez di xefika nêçîrvanan de bimirama" û qîrîniya xwe bi ser rovî de domand.

Rovî got:

-Heyran qey tu dîn bûyi ev der tiji rovî ne, kî zane kê wiha li serê te kiri-ye. Bi dîn, bi iman, bi namûs û bi telaq ew roviyê ku tu lê digerî ne ez im. Ez roviyekî xizan im, ez zembîlan çedikim û difiroşim, haya min ji vê meseleya te tune. Tu bixwazî ez û tu emê bibin birak û li ba min be, emê bi hev re bijîn. Gur ji wan gotinêñ rovî yeqîn kir û qayîl bû û disa bi hev û du re bûn birak.

Çendekê bi şûn de gur got:

-Birako ez jî dixwazim alîkariya te bikim. Rovî got:

-Tu eyb nakî tu van tiştan dibêjî, tu hem birakê min û hem mîvanê min û, tu karekî neke, were min bingeha vê zembîlê çekiriye tu di hundîrê wê de rûne da ku nezivire, ezê wê çebikim tu jî ji xwe re li min temaşe bike. Gur hat di hundîrê zembîlê de rûnişt û di xew ve çû.

Rovî jî zembîl li gorî bejna gur çêkir û devê wê zexm girt û rahişte wî û ew anî li kaşê miqabili gund ser berjêr tevî zembîlê gindirand nava gund. Wexta kuçikan dît, êrişî ser zembîlê kirin, gur perîşan kirin. Gur bi zehmetî xwe xelas kir, vegeeria got:

-Bi dîn û bi iman ezê tola xwe ji rovî re nahêlim.

Rovî dît ku gur disa hat, wî got: Wê ev mîrat taliyê qetla xwe bixe stûyê min. Bisekine "wek ê ku çûbû heyfa bavê, qûna dê li ser kir" ezê jî wiha li gur bikim, bikujim û xwe jê xelas bikim."

Rovî bi zanatî xwe nîşanî wî kir û reviya. Wexta ku gur ew dît hema bi lez û bez berda dû xwe. Demeke dirêj reviya û hat nêzîki kona xwe yê bi du derî û bi lez xwe avêt devê konê yê teng tê re ket hundir. Gur jî li bayê bezê xwe li devê kon qeliband û tê de ma asê. Rovî di deriyê fireh ê din re derket û hat pişt gur her du hêtêñ gur di devê kon de parce kirin û ew kuşt û xwe jê xelas kir.

Rovî disa bû xwedî war,

Kêfa xwe anî ji dil,

Got: Ez im paşayê vir.

ABAS ALKAN



Tiştekî min heye ji tiştan; belkî baniya  
sibê zû dihere ser xaniyan

Hûno mûno duqûno

Guhek rêsî naçê, birek bizinreş diherê

Satilek mast, li cihekî rast

Bi şev bela, bi roj kela.

Tiştekî min heye serê sibê zû azan dide,  
kero dîk e, ehmeqo dîk e

DÜ Ü SOPE

BŞMŞCİ

ÖMLÂŞÇU

HÈLLA

KULJAS MİVİMASU

DJK

Tiştekî heye heta tu goşt nedê nahere

Kumikê hûtik, tijî nûtik

Ez li avê didim dişkê  
Ez li tehtê didim naşikê

Bizina kal  
Diçe ser berê al  
Ez êê dikim oo dikim nayê xwar

ZOL-BEŞİVA

HEYL

KŞXIS

HELLA

Hilindir bilindir  
Kur ji bavê bilintir

Siniya savarê  
Li ser darê

Hespê boz  
Dora xwe kire toz

Emer e Emer e  
Du kirâşen wî spîn e  
Yek zer e

Ker û pêşti

HİML

A

HÇK

GELERİ

# Ji Evdila Peşêw ne helbestê helwest

Mamosta Peşêw bi kurmanciya jêrîn helbestên xwe ristine û heta niha helbestên wî di pirtûkekê de nehatibûn komkirin. Belê di rojname û kovarê kurdî de, tevaya helbestên wî hatine belavkirin.

**D**i demeke kurt de, piştî weşana gelek berhemên hêja yên nivîskarê kurd ku ji çîrok, roman û helbestên kurdî pêk hatine, heftiya çûyî Weşanxaneya Avesta, bi berhevkirin û weşandina helbestên Evdila Peşêw di namîlkeyekê de ku 78 rûpel e, bi navê "Veger" an jî "Birakuji" (Sernavê du helbestên helbestvan in), namîlkeyekê dîtir a helbestî li berhemên xwe zêde kir.

Mamosta Evdila Peşêw, yek ji helbestvanê navdar ê başûrê Kurdistanê ye. Di sala 1963'yan de, wekî her lawekî kurd Evdila Peşêw jî, di şoreşa rezberê de mawey demekê pêşmergetiyê dike. Paşê welat dihêle û ji bo temamkirina xwendina xwe diçe Sovyeta bêrê, li Moskovayê niştecih dibe. Mamosta Peşêw, bi salên dûr û dirêj, li weletê xwe yî ku ji can û jiyana xwe bêhtir jê hez dikir, venagere. Derbaskirina sîh salên rabak dûrî Kurdistanâ xoştîvî, ji bo mirovekî wekî E. Peşêw ê hisyar û heshtenik, helbet, ravekirina vê keser û daxê wê sext be.

Eva hûn dibînin, qey nû ye?

Demjimerek e.

Bi temamî sîh sal e hatiye barkirin. Bêseyde ye, sed car bidî pêş û paş, Çırkeçirka wê şîfra mirinê ye

*Lanetjimêr e,  
Nasekine heta neyê hûrhûrkirin.*

Piştî kul û kesera sîh salên rabak dûrî Kurdistanâ xoştîvî, Mamosta Peşêw di sala 1993'yan de, bi dilekî xweş, bi rûyekî geş, serbest û aza vedigere tozgevzka jîn... Vedigere kevnearwan.

Hîna bi "Şekrebajêr"ê xwe şâ nebûyî, hîna li kolanê Hewlêra ku lê mezin bûye têr negeriyayî, hîna li dor wargehê Mîr Mûsek sema nekirî, bi teqîna fişekîn kurdkuj, ji xewn û xeyalên xwe yên sava dûr dikeve. Ew şerê birakujiya ku di 1964'an de ji ber reviyabû, mişabin ku hîna bi dawî nehatiye. Du şerîn cîhanê bi dawî hatin lê, hîna şerê birakujiya kurdan bi dawî nehatiye. Ew Sovyeta ku Peşêw bi salan lê jiya, bi dawî hat lê, hîna şerê birakujiyê bi dawî nehatiye.

*Sekrebajara min a xembar  
Govendkêşa min a cilres  
Azada bindest,  
Dayika min, kezeba min  
Haydar be.  
Ya didin te,  
Jehreav e, jehreav e jehreav  
Haydar be,  
Ya didin te jehreav e,  
Jehreavekê tîr.  
Bade, her bâda berê ye*

*Çi ev dest bidit, ci ew dest.*

## Li ser zimanê wergerê

Mamosta Peşêw bi kurmanciya jêrîn helbestên xwe ristine û heta niha helbestên wî di pirtûkekê de nehatibûn komkirin. Belê di rojname û kovarê kurdî de, tevaya helbestên wî hatine belavkirin. Wisa diyar e ku ji layê rêzdaran Rûken Bağdu Keskin û Bedran Hêbib ve, ji kovar û rojnameyên kurdî hatine berhevkirin û her ji layê her du rêzdaran ve, ji kurmanciya jêrîn bo kurmanciya jorîn hatine wergerandin. Heta bi vir her tişt pak û ciwan e, lê di wergera wan de xweş diyar dibe ku di zimanê kurdî de kêm şareza ne û bi taybeti zimanê wan i helbestî lawaz e û nekarîne têhî û bêriya dilê helbestvan bi dirustî bînin ziman. Bo nimûne, rûpela 13'an, rêza pêşin ji helbesta Pêlav:

*"Cotek pêlavên reş li min in"*

Pêlav ne cil in ku bêñ lixwekirin, dikevin piyan.

Rûpela 16'an, helbesta Dijberî.

*"Şev di xew de  
Min aramgeha "Hacî" dit  
Min li ber çok da  
Min sejdê da (...)"*

Pêkanîna hevokeke helbestî emê deynin rexekî, ez bawer nakim ku li seranseri Kurdistanê mirovekî ku bi kurdî dipeiyive, karibe "min sejdê da" bi kar bîne. Kurd dibêjin; li ber wî çûme sejdê. Yan jî, li ber wî ez sejde bûm û hwd. Digel daxwaza min a lêborînê ji



her du rêzdaran, pirsek min heye. Gelo, we çawa kariye hevokeke wisa seyr damezrînin?!

Nimûneyên bi vî rengî di zimanê her du wergrêne pirtûka de mişê ne. Bi kurtayî min divêz ez bibêjim ku, wergerandina helbastan ne karekî bi sanahî ye. Karekî tenik û zor pêjinker e. Zanîna bi zimanekî ji bo wergerandina helbestê ne bes e...

D. Ş. TIZYANÎ

## Em ji te re dibêjin yadê

### DILBIXWÎN DARA



**Ê**dî wekî berê roj derbas nabin. Em berê xwe didin kîjan alî, agir ji wê derê dibare. Emê li ser çi binivîsinin, li ser çi nenivîsinin..? Duh me çi got, em iro jî bibêjin? Wê kî li me guhdarî bike? Kê berê li me guhdarî kir, ku iro jî bibe guhdarê me? De werin, bibînin, bibîhsin...

Çavên me çi dibînin? Her der bûye agir. Dilê me bûye sêleke sor û her roj em li ser wê sêlê dişewitin. Me dest pê kiriye ku em canê xwe bixwin, xwîna xwe vexwin û ji hev re me benê îdamê hazir kiriye, çiqas bi me xweş tê dema ku em hev dikujin.

Em nikarin ji hev hez bikin, nikarin hev nekujin, nikarin xwe ji dijmin qut bikin. Diya me, em li ser sînoran ji ber xwe avêtine ser rûyê erdê. Carekê em bi destê hev digirin, cara din em destê hev dişikînin, carekê em bi

hev xweş in, cara din jî wekî li kolanê. Teksaşê em bi çekan didin pey hev û mîr ew e ku bibe qatîl.

Li Başûr kuştina însanan mîraniya herî mezin e. Bi sed dolarî tu dikarı însanan wekî mirîşkan bikuji. Lî belê, hesabê ku sibe were xwestin wê pir giran be.


Dayik bi me dikene. Dayikên xelkê di van rojan de zarokên xwe dikin zava, dayikên me jî li devê riyan şînê digerînin. Çavên min kor dibin dema ku ez van dîmenan dibînim, her dayikeke ku derd û kulên hemû welat dane ser pişta xwe û di dawiya rojên xwe de berê xwe daye sînoran, diya min tîne bîra min, ew dayikên me ne... Tu caran ev birîna ku di dilê wan de mezin vebûye, wê vê êşê ji bîr neke.

Em ji te re dibêjin yadê.

Tu diya me yî  
Dîsa berê te dane sînoran  
vê zivistanê...  
Di dilê ewran de rehm nîn e  
Ez dizanim,  
wê serma dergûşê di rehmê te de bikuje  
Zor e...  
Lê belê te berê ev stran  
dirêj dirêj gotiye,  
li ser van riyan...  
Di bîra te de ye melodiyê sirgûniyê...

Zarokê xwe biavêje pişta xwe û biçe  
Hema biçe,  
Pişta te çiya, pêşıya te çiyan e  
Ev der Başûr e yadê!  
Hîna lekeya xwînê ji ser keviran neçûye  
Hîna devê tivingan sar nebûye  
Dûmana di devê wan de em şewitandin  
Rê dirêj e... pir dirêj e...  
Ne destpêk e,  
Ne dawî ye  
Belkî tu li ser van riyan can bidî  
Kî ye yê ku cenazeyê te rake?!

Kî ye yê ku bibêje ev rojekê diya me bû....  
Ev der Başûr e,  
kur diya xwe difiroşe, bavê xwe dikuje  
Yek li Enqereyê,  
yek li Tehranê  
yek jî li Bexdayê  
çîroka "Hezar şev û şev" dibêjin  
Kî te nas dike?  
Kî dikare te nas bike?  
Her kesî destê xwe daye ser zikê  
xwe û direve...  
Diçin ku derê?  
Tu bimîne!  
Li benda "zarakan" bimîne  
Zarokên ku te nav li wan danîbû  
GERILA...



## Bila ewrên dewleta tirk nebînin!

**L**i gundekî Kurdistanê malekê nû çanaxek standiye, li MED-TV'ye temaşe dîkin, carina ekrana televîzyonê baş nîşan nade.

Kesên malê hema radibin êrîşî ser xanî dîkin, gelo leşkeran çanax dizî çi bû. Bi vî awayî her roj eynî tiştî dîkin. Pişt re se çar gundi jî têr malê dibînin ku her tim wisa diciine ser xanî û têr, mîvan dipirsin

—Ma çi bûye hûn hema diciine ser xanî û têr?

Xwediyê malê dibêje:

—Wele tirsa me ew e ku leşkeren dewletê çanaxa me bidizin.

Mîvan dibêjin:

—Ma leşkeren dewletê werin wê hema hildin bibin, ew bi diziyyê vî karî nakin.

Xwediyê malê dibêje:

—Îcar ji ber çi ye ma ekrana televîzyonê hema wisa diçe û tê?

Mîvanek hema ji cihê xwe radi-be, dibêje:

—Lo wele bile ewrê dewleta tirk hatine vê derê nahêlin em li MED-TV'ye temaşe bikin. A hûn

bawer nakin rojnameya Demokrasi jî nivîsandiye, dewleta tirk ewr çê-kirine, dişine ezmanan nahêlin kurd li MED-TV'ye temaşe bikin.

Pişti gotina mîvan xwediyê malê radibe perdeyeke tul hilde, dertê ser xanî, davêje ser çanaxê

Jê dipirsin te çima wisa kir. Dibêje:

—Min jî çanaxa xwe kamûfle kir, bila ewrê dewleta tirk wê nebînin.

M. DAREBÎ

—Wele tirsa me ew e ku leşkeren dewletê çanaxa me bidizin.

Mîvan dibêje:

—Lo wele bile ewrê dewleta tirk hatine vê derê nahêlin em li MED-TV'ye temaşe bikin. A hûn

## Mirî jî serî hildidin!

R

ojekê ji rojan, li gundekî Midyadê, fermadarê ARGK'ê fermanê dide, ji bo ku gel rabe serhildanê. Pişti fermanê, gel radibe serhildanê.

Lê mixabin di gund de yekî tirsonek heye. Ji tirsâ zîndan û lêdanê gazi zarokên xwe dike û ji wan re dibêje:

—Lawo, heke cendirme bavêjin ser gund, ezê xwe li mirîtiyê deynim û têkevîm nav nivînan.

Hinek ji we bila Quran û Yasînân bixwînin, hinek jî bila bigirîn.

Navîneke kin dibore, cendirme bi ser gundê wan ve digirin.

Cendirme li nav gund belav dibin û hinek ji wan cendirmeyan diçine mala wî mirovê tirsonek.

Dema dikevin malê çavê zarakan bi cendirmeyan dikevin hinek ji wan li çongêñ xwe dixin û hinek jî, ji wan dest bi Quran xwendinê dîkin.

Ji ber ku cendime ji serhildanê aciz bûbûn, hema kî dikeve ber çavêñ wan li wan didin.

Wexta ku li zarokên xwediyê malê dixin yê "mirî" jî di nav nivînan de gelek ditirse.


Wexta ku girîn bi zarakan dikeve cw jî, ji nav nivînan hildifire û ber bi serhildanê ve direvel Cendirme ji tîrsan dikeve heyecanê û dibêje:

—Oğlum, ölüleri de dirilip yürüyüse katılıyorlar

Yanê "Kuro miriyê wan jî sax dibin û tevî serhildanê dibin."

## BIXELAT...

## XACEPIRSA BIXELAT (35)




### Bersiva Xacepirsa 33'an

Xacepirsa me bixelat e.  
Di 15 rojan de ci bersiv  
bigihîjin me, emê wan binixînin  
û bi riya pişkê li 10 kesan belav  
bikin. Xelata hejmara me ya  
35'an pirtûka  
Evdila Peşew  
"BIRA KUJİ" ye.  
Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin,  
divê hûn "Peyva Vêşarı" di nava  
qutiyen li bin xacepirse de binivîsin  
û tevî adresa xwe ji me re bisînin.


Kesênu xelata xacepirsa 33'an, pirtûka Sîma Semend "XEZAL" qezencî kirine: İbrahim Çantepe/ İzmir, Ömer Yılmaz/ Edene, Zeki Bazîdî/ Bazîd, Sabriye Elik/ Stenbol, Abdullah Dengiz/ Edene, Abdullah Sezîs/ Wan, Evîn Sozan/ İzmir, Şaban Tan/ Bartın, Yavuz Yeter/ Bartın, Jîyan Ronizer/ Batman



PEYVA VESARI

1 2 3 4 5 6 7 8





## Pîrikâ kuçeya Şowalyeyan

*Destpêk Rûpel 5*

Bextreşıya pîrikê ji navê kuçeya ku ew lê di nav dehşeta mirina bi tenê de bû, dihat. Ewê li nav 'Kuçeya Şowalyeyan', ji aliyê cenawirê kapitalizmê vebihata daqurtandin. Hem jî li vê kuçeya ku navê van şervanên seglawî, ku wan, canawirê çirokan dipelişandin, girtibû. Ew di şexsê pîrikê de wekî bêbextiya mirovahiyê bû.

Mirov nikare bawer bike ku, wextekî şowalye li vî welatî jiyan. Her çiqas heykelên van şervanên berê çend quncikên muzeyan dagir kiribin jî, wekî mexlûqên ku ji alemeke din hatibin, biyan û (li cihekî) çewt têxuyan li vî bajarî. Şowalye sembolên mîrasyiyê bûn. Bi tenê û di mercen wekhev de şer dikirin, sadiq û merd bûn. Lî tevî wî ruhê xwe koç kirin, çûn û di demen din de man. Niha rêçen wan bi tenê li ser lewhayê navê kuçeyan têx dîtin. Ü di çavên mirovên ku tenê dijîn û tenê dimirin de, hesreta erdemên wan tê xwendin.

Li Ewrûpayê şoreşa sanayıye dezgehêن

xwe yên makîneyan ne tenê li hewşen kar xaneyan ava kirin. Di wê pêvajoyê de ew makîne di nav dilên însanan de jî hatin montekirin. Kapitalizmê felsefeya xwe jî afirand. Bi metayê filozofen kapitalizmê, mîjîyê mirovên birçî jî hat tijikirin. Dema awayê hilberînê hat guhertin, têkiliyên nav însanan jî guherin. Di dezgehêni kapîtalizmê de pêşiyê tiving hat içatkirin, paşê şowalyetî xera bû. Hinekan ew erdemîyen demen berê, wekî karê dînan bi nav kirin. Cerwantes navê nûnerê van erdemân "Donkîşot" danî.

Kapitalizmê, bazar û mirov bi hev re herimandibûn. Ên ku dixwestin paqîj bimînin, bi çavên dînan li wan dihat mîzekirin. Pêşiyê mirina ideolojiyê, paşê ya evînê, ya malbatê, ya civatê û ya wîjdan, a ruh, nîhayet mirina însan, hêdî hêdî tune bûn....

Demeke biharê bû. Jiyanê xwe seranpê xemilandibû. Paceya li 'Kuçeya Şowalyeyan' edî vala bû. Pîrikê tevî keder û xemên xwe

bar kiribû û ji nav me çûbû. Laşê wê yê ku di piş camen qirêjî de riziyabû, esasen wîjdanê rizî yê mirovahiyê bû.

Hemû civak û neteweyan ji aliyê dîrokê ve, wekî hev ji vê dafikê dûr in. Ji bo ku em di dîroka mexlûqên tevingoşt de bi şeklê qonaxeke hov û bêhîs nekevin qeyda, girîng e em windayiyê xwe, ewen ku me dane cenawiran, em careke din bi paş ve bistînîn, careke din em wan kiş bikin. Mirovahî mecbûr e ku şowalyeyen xwe ji nû ve vejîne. Sokratên xwe, Spartakûsên xwe, Marksên xwe, Cheyên xwe, Rosayên xwe û bîlcumle şowalyeyen windayî yê din. Ji bo ku li hemberî cenawirê kapîtalizmê yê ku agir ji devê wan dibare li ber xwe bide. Ji bo ku kehaneta Fukiyama, ya bi rengê 'dawiya dîrokê hat' vala derxe. Ger mirovahî ji qirêja kapîtalizmê wîjdanê xwe neparêze, rîwingiya xwe ya ku pêncî hezar sal berê bi awayê 'Homo-sapiens' dêst pê kiribû, dikare bi awayê 'Meta-sapiens' biqedîne.

**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayincılık  
San. Tic. Ltd. Sti. adına  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN YÖYLER

Gerinendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)  
AYNUR BOZKURT  
SAMÎ TAN  
RAHMÎ BATUR

Berpirsê Karên  
Nîvîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpirsê Sazîyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHÎR ELDEMİR

**NAVNIŞAN**  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

**CAPXANE**  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.  
**BELAVKIRIN**  
BİRYAY Dağıtım

**NÜNERİTYEN ME**  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimnendeyê Giştî  
yê Ewrûpayê:  
Mazhar Günbat  
Suriye: Jan Dost  
Helim Yûsiv  
963-21-960099

**Berlin:**  
Silêman Sido  
49-30-69002695

**Hannover:**  
Selim Biçük  
49-5721-81360

**Munchen:**  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

**Bruksel:**  
Medenî Ferho  
32-02-466037

**Stockholm:**  
Robin Rewsen  
46-8-7510564

**Bonn:**  
Ahmet Baraçlıç  
49 228 66 62 49

**Celle:**  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36

**Azadiya WELAT**

**SEVA HEVNASÎNÊ**

**BERNAMEYA ŞEVÊ**

Em dixwazin we di şahiya hevnasînê ya Azadiya Welat de li cem xwe bibînin. Werin em hev û din di şahiyeke kurdî de binasin, rojnameya xwe xurt bikin. Bi beşdariya we dê hêviya azadiyê geşir bibe.

Azadiya Welat azadiya ziman e.

Ji Başûrê Biçûk hunermendê navdar Seîd Yusif beşdari şeva me dibe.

Her wiha di şevê de komên muzîkê, govendê û gelek stranbêjên navdar hene.

Cih: Karides Restaurant

Navnişan: Kenedi Cad. Yenikapı No: 90

Dem: 4 Kewçer (Ekim) 04.10.1996

Saet: 19.30 dest pê dike

Hûn dikarin ji vê telefonê agahî bistîn: 251 13 90

# B i gesahî hate bibîranîn

Di qetilkirina sala çaremîn a Musa Anter de careke din kurd û tirk, Musa Anter bi bîr anîn. "Zarokên Apê Musa" soz dan ku pênuşa wî, wê li erdê nemîne.

**d**i qetilkirina sala çaremîn a Musa Anter de, ji aliye saziyêndan kurdan ve li Stenbolê gelek çalakî hatin lidarxistin. Yek ji wan çalakiyan, wekî tê zanîn piştî qetilkirina Musa Anter ji bo bîranîna wî her sal "Xelatîn Rojnamegerî yê Şehîdîn Çapemeniyê û Musa Anter" tên dayîn.

Cara pêşîn ev xelat di sala 1993'yan de ji aliye Rojnameya Özgür Gündemê ve hatibû dayîn. Piştî wê li dû hev Rojnameya Özgür Ülke û Yeni Politikayê, îsal jî Rojnameya Demokrasiyê ev xelat dan.

Roja 20'ê rezberê li Navenda Çandê ya Mecidiyeköyê, bi sazûmankariya Rojnameya Demokrasiyê "Xelatîn Rojnamegerî yê Şehîdîn Çapemeniyê û Musa Anter" di çar waran de hatin dayîn:

Beşa Nûçeyê, Beşa Lîgerîn û Lîkolînê, Beşa Kârikaturê û Beşa Wêneyan.

Ji xeynî van çar besan, îsal Komîteya Çavdêriyê ya Girtigehan jî, ji ber xebatêñ xwe yêñ li girtigehan, "Xelata Taybet a Rûmetiyê" stand. Li ser navê komîteyê Ercan Kanar ev xelat girt.

Di vê şevê de gelek sîmayêndan kurd û tirk ên navdar hatin dîtin; mîna Abdülmelik Fırat, Feqe Hüseyin Sağrıç, T. Ziya Ekinci, Dicle Anter, Ragip Duran, Ragip Zarakolu, Mehmet Metiner, Ahmet Soner, Şefik Beyaz, Cihan Sincar, Eren Keskin, Tomris Özden, Suna Aras, Nadire Mater, Ercan Kanar û hwd.

Gelek malbatêñ şehîdîn çapemeniyê û ji rojname û kovaran jî gelek rojnameger besdar bûn.

## "APÊ..."

Roja 21'ê rezberê jî li Navenda Çanda Mezopotamyayê saet di 16.00'an de, ji aliye Teatra Jiyana Nû ve lîstikeke nû ya şanoyê bi navê "Apê..." hate pêşkêşkirin. Ev lîstik cara pêşîn bû ku dihate nîşanda-

yîn.

Mijara vê lîstikê ji çîroka Murat Batgi hatiye wer-girtin. Murat Batgi jî yek ji şanogerên Teatra Jiyana Nû yê NÇM'ê ye.

Di vê lîstikê de gelek kîmasiyan, mîna baş bikar-neanîna dengê xwe û baş nezanîna kurdî ya lîstikvan bala mirov dikişandin.

Bi kurtasî mijara lîstikê ev bû:

Yekî kurd bi hevalê xwe re sohbeteke dûv û dirêj dike. An jî ya rast hevalê wî dibêje û ew jî guhdar dike. Piştî demeke dirêj êdî ew nikare guhdar bike û di-keve xeweke giran. Camêr di xewna xwe de li kevi-ya behrê ye û ji ber nakokiyêndan ku di serê wî de ne, bi xwe re hesab dibîne. Dû re di giraniya xewê de dibîne ku bi Apê Musa re ketiye sohbeteke ges. Ew ji Apê Musa re ji rewşa kurdan a van rojîn dawîn behs dike, Apê Musa jî, ji rewşa xwe û ya wê derê.


Ev camêr ji xew radibe, dibîne ku di nav xwêdanê de ye û hevalê wî hê jî li cem e. Lê bi derbasbûna sa-etal êdî ew nizane ew tiştîn ku dîtibûn xewn bû an rastî... Her wiha lîstik dewam dike.

## Panela "Çinara Kevnare Musa Anter"

Piştî lîstika şanoya "Apê...", di saet 18.30'an de jî dîsa li NÇM'ê ya Stenbolê panelek bi navê "Çinara Kevnare Musa Anter" çêbû. Gerînendeyê Weşanê yê Giştî yê Rojnameya Demokrasiyê Mehmet Oğuz, Zi-manzañ Feqe Hüseyin Sağrıç, Nivîskar Muhsin Ki-zilkaya, Rojnameger Ragip Duran û kurê Musa Anter Dicle Anter wekî axivger besdarî vê panelê bûn.

Her yek ji wan li ser taybetiyêndan Musa Anter û ji bîranînen xwe yêñ ku pê re eleqedar in, behs kirin. Kurê Musa Anter Dicle Anter bi xemgînî ev tişt anî zimîn:

# Apê Mûsa



"Vêga her kes li hêviyê ye ku ez ji bavê xwe behs bikim. Lê rojîn ku me pê re derbas kirine ku em bînîn ba hev, belki yêne we zêdetir bin. Ji ber wê ji ew ne tenê bavê min bû, bavê we jî bû."

Zimanzañ Feqe Hüseyin Sağrıç, girîngîya peyivna bi zimanê kurdî anî ziman û heta dawiyê axaftîn xwe bi kurdî kir. Sağrıç bêhtir li ser nuktedanîyî Musa Anter sekinî û got:

"Gotin wisa li hev dianîn ku, tiştîn ku wî digotin eger min bigotana herhal wê kîfa tu kesî nehata, lê ew wisa xweş dipeyivî ku tu kes jê aciz nedibû."

## "Zarokên Apê Musa"

Teatra Jiyana Nû roja 22'ye Îlonê jî çalakîyêndan xwe yêñ li ser Musa Anter domandin û lîstikeke şanoya ya bi navê "Zarokên Apê Musa" li navenda xwe pêşkêş kirin.

Di vê lîstikê de bi taybetî lîstikvanenîn biçûk cih girtibûn. Ji ber performansa wan a baş, ji aliye temâsevanan ve ev lîstik gelek hate ecibandin. Ku mirov bi kurtahî ji mijara wê behs bike:

Du pêxwasen (qirixen) biçûk ên Amedê Rojnameya Özgür Gündemê belav dîkin û debara xwe jî pê dîkin. Rojekê piştî ku rojnameyêndan xwe belav dîkin, her du bi hev re diçin buroya rojnameyê. Lê dibînin ku buro ne ew buroya berê ye; ji tu kesî deng der-nakeve; di dawiyê de şehadeta Apê Musa hîn dibin. Pêşî digirîn, li xwe didin, lê dibînin ku ev ne çare ye. Yek ji wan pêxwasan diçe ser daktiloyekê rûdîne û dest bi nivîsandînê dike û bi vî rengî soz dide ku pênuşa Apê Musa wê li erdê nemîne.

AYNUR BOZKURT



Lîstikvanen Teatra Jiyana Nû di lîstika "Apê..." de tên dîtin.